

# Kurd peyama

Rojnameya Gîştî ya H  
Kurdish weekly newspaper

Newspoint Media GmbH Dreieichstr 3A 64546  
Mörfelden; Entgelt bezahlt; VKZ 65774

Birnebun  
Postfach 90 03 48  
51113 Köln

27

11.03.2005

Kurdische Wochenzeitung

Emerîka û Sûriyê...siyaset-medarêñ Rojavayê Kurdis-tanê li ku ne?

Rûpel 2

Dewleta Elî  
Namûs û kuştina jinkê ji  
ber namûsê

Rûpel 7

Rûreşiyek din a dewleta  
Tîrk

Rûpel 6

Derheqî Kirdkî (Kirman-cî) de kombiyayışî des û  
hîrêyine viraziya

Rûpel 17

Ali Haydar Koç  
Paktek ket nav dîrokê  
(Pakta Bexdayê-1955)

Rûpel 6

Hespi Aydin  
Di Cûntayî û Cûntacîyî emir  
Derg

Rûpel 17

Rêber Mihemed  
Serhildana Qamişlo

Rûpel 5

Hevkariya Komelêñ  
Êzîdiyan li Elmanya  
Daxuyanî derbarey kam-panyaya negatîv li dijî Êzî-diyan - (Beşê I)

Rûpel 10

Ghobadi û Akîn li  
Meksîka xelat  
wergirtin

Rûpel 14

## Helepçe

Em bi hevre mirin mirovno!  
pênc hezar însan  
ne şînahiya asîman  
ne xweşîkbûna kulîkkan  
herikîna çem û rûbaran  
û ne jî berbangêñ awaz cîvîk xema me ye êdî.

Berken Bereh



Ji niha û 17 sal berê dijminêñ ronahiyê ji bo ku Kurdan dibin tariyê de bihêlin bi carekê 5 hezar can kuştin. Piştî 17 salan gelê Kurd perda tarîtiyê çirand û derketin ronahiyê; celladên gelê Kurd di tarîtiyâ dîrokê de winda bûn. Hûn pênc hezar can di dilê gelê Kurda dijin.

## Çêtirîn diyariya 8ê Adarê ji Kurdistanê hat

Li Başûrê Kurdistanê jinêñ Kurd mohra xwe li dîroka jinêñ Rojhilata navîn xistin û rê li ber cînayetênamûsê girtin. Piştî derketina vê zagonê hejmara cînayetênamûsê ji sedî 70ê kêm bû. Parlamentoya Kurdistanê, bi derxistina Zagona Medenî qedera jinêñ Kurd guhert û wê ev guhertin bandora xwe li herêmê ji bike.



Rûpel 3

## Navê rûviyêñ Kurdistanê hat qedexekirin



Nûce û Şîrove


Kurdistanîti, li rûviyêñ  
welatê me jî qedexe ye! ...

Rûpel 2 û 6

Necdet Buldan

Jinêñ  
kurd bi  
hilgirtina  
çekan û  
derketina  
serê çiyan  
gaveke  
pir balkêş  
avêtin

Rûpel 9



Z. Abidin Kızılıyaprak

Nesrin Rojkan

Afife Evîn Çîçek

Bedirxan Epözdemir

Carna xeyalêñ  
dayîkêñ we, ...

Gidî gidî 8ê Adarê!

Li ser azadiya jinan  
çend gotin!

Nivîsa rebenê

Rûpel 5

Rûpel 4

Rûpel 8

Rûpel 14

D 1.50 EUR, A 1.70 EUR, B 1.70 EUR, NL 1.70 EUR, CH 2.60 SFR  
LUX 1.70 EUR, 11.70 EUR, \$ 19.00 SKR, DK 14.00 DKR,  
N 16.00 NOK, GB 1.10 £, GR 1.70 EUR



27

# Kurdistanîti, li rûvîyê welatê me jî qedexe ye! Gelo Tirk dê bi vî zihniyet û siyasetê bi ku ve herin?

Bayram Ayaz

**R**oja yekê adarê nivîskarê rojnameya Hurriyetê Yalçın Dogan, nivîsarek bi navê „Vulpes Vulpes Kürdistanicum „nivîsi.

Nivîs e, îxbarnameye ne diyar e. Yalçın Dogan bahsa projeyekê dike, dibêje li Tirkîyê weqifek heye bi navê Weqifa Nêçirê û Parastina Jîndariya kûvi. Vê weqifê xwestiye ji bo parastina rûvîyê sor li hêla Qerekosê bi komaleyek ji herêmê bi hevra (Komeleya Xwesikkirina Agiriyê) projeyek pêşkeshî saziya bi navê UNDP (United Nations Development Programme - Programê Pêşdexistinê ya Yekitiya Miletan) bike. UNDP, ji bo projeyen wisa ji hezar heta pêncî hezar dollarên Amerikî alikariya diravî dike.

Dest bi veguhesina nivîsan kirine. Bersiv ji UNDPê hatiye.

Di bersiva UNDPê da rûvîyê sor bi navê zanistî (latîni) *vulpes vulpes* Kürdistanica derbas bûye. Xuyaye hinekan ji vê Weqifê ji ber navê Kürdistanê ev nivîs gîhandine rojnameyan Yalçın Dogan.

Wey lo li mino, hûn in, yên navê rûvîyê sor bikin rûvîyê Kürdistanê!

Helbet Y. Dogan devê wi nagere û destê wî ji nagire ku gotina Kürdistanê binivise. Gotinê diqûlipîne û dibêje rûvîyê Kurd (Yani, Kürt tilkisi.. Tirkî, Y. Dogan). Çawa be Tirk hineki hînê gotina Kurd bûne, bikaranîna bêjeya Kurd wan zêde naqehîne! Lê gotina Kürdistanê, ji bo wan wekî paçê sorê di destê matadorê İspanî de ye! Hema ku gotina Kürdistanê dibînin, har u gêj dibin.

Ev zilamê cahîl di nivîsa xwe da ideâa dike ku ev leyiztikek e. Ew dibêje navê rûvîyê sor li hemî dînyayê rûvîyê sor e, lê saziyekê Yekitiya Miletan (UN) ji bo ku pêçîya xwe têxe nav me navê rûvîyê sor kirîye "rûvîyê Kurd". U mîrîkê min dinivise dibêje "ji xwe ji ber van destîwerdanêner derve di nav me da heta nuha gelek caran Kurdan serhildaye, hertim ji pêçîya hêzîn derve tê de hebûye!

Tîstêni wisa bê mane di medîya Tirkan

de tijene. Mirov dikare bêje, gelo hewceye ku yek dema xwe bi van tiştêni vala re derbas bike?

Bi rastî ji ev tişt sosretî û pêkenîn e. Lê divê em di ser ra derbas nebin. Ev zihniyeta rewşenbirêne Tirk û civaka wan e. Her wisa siyaseta dewleta Tirk e.

Nuqtayek heye pêwist e em balê bikşîn ser.

Tirkîyê dixwaze bibe endamê Yekitiya Ewrûpê. Ji bo vê prosesê hin yasayen xwe diguherîne. Gotina Kurd ji êdi weke berê ne tabû ye. Heta li ser kaxizê rî li ber weşanê bi zimanê Kurdi vekrine, û Kurd dikarin di gûrşen zimanê Kurdi yên prîvat de hînî zimanê Kurdi ji bibin! Em dizanîn ku ev tişt hemî çavîgirêdan û xapandin e.

Hela binerîn... Pişti ku ev nivîs di Hurriyetê da derket. Wezareta Tirkan ya Dorberê û Dahlan normen navnetewîzanîti da ber lingê xwe û ilan kir ku wan navê rûvîyê sor ye Latinî guherîne, gotina Kürdistanica (jîli Kürdistanê) jê derxistîne. Ji ber ku navlêkirineke wisa zerafî dide yekitiya Tirkîyê! Navê pezkoviyeji ji guherîn ku gotina Armenica tê de derbas dibû.

Ew zihniyet û siyaset, gelek xeter e û ji bo insaniyete şermezariyek e. Ev yek her wisa nişanek e, bê ideolojiya nasyonalist-şovenist a Tirkan (Kemalîzm) bi çiqasî dijminê gelê Kurd û kêmnetewan e! U ew hêj ne amadene, dev ji vê ideolojiya xwe ya hişk û êrişker berdin. Ev yek ji bo demokratizekirina Rojhilata navîn astengiyek dijwar e. Bi bîryara Kongreya Amerîkayê ya dawî xuyaye êdi ev yek li ber Amerîkîyan ji zelal bûye ku ideolojiya nation-stat ya Tirkan (Kemalîzm) astengiyekke li pêşîya guherîn global li Rojhilata navîn.

Ev nimûne bi serê xwe delileke girîng e. Dewleta Tirk navê me, navê gund û bajaren me, deş, zozan, çiya û beriyen, çem û rûbarêne me hemî guhertin û xwestin bi destezorîye van tiştari bi me bidin qebûlkirin. Ev xirabî û êrişkeriyen wan, perçeyek ji siyaseta wan ya asimîlekînina Kurdan, tunekirina gel û welatê

me ye. Gelek zerar û ziyan dan me, lê bi sernekîtin.

Divê em vê siyaseta wan pûc bikin. Ji bo vê ji divê em li bakurê Kürdistanê û Tirkîyê, di her asti de êdi bi navê xwe, bi nasnameya xwe derbi Kevin meydanê. Bi her karê xwe, ferqa xwe ji Tirkan diyar bikin û bi dînyayê nişan bîdin. Navê Kurd û Kürdistanê divê ji me ra bibe, serê gotinê û dawîya gotinê. Li Tirkîyê bîsmîla me divê gotinê Kurd û Kürdistan bin.

Dewleta Tirk ê bixwaze Kürdistanîtiya rûvîyê sor veşere, em ji divê xwedî li lêkolîn û navlêkirinê lêkolînvanê Rûsi Sergey Satunin derbi Kevin û bêjin rûvîyê sor a hêla Serhêdê li Kürdistanê.

Eger em nikaribin xwedî li rûvîyê xwe derkevin, emê nikaribin xwedî li welatê xwe, Kürdistanâ bav û kalan ji derkevin. Kula dewleta Tirk hemî ew e ku nav, hezkirin û mevhûma welat, yanî ya Kürdistanê bide jibirkirin. Pirsa Kürdistanê ji pirsa welat û xelkeki xweser dûr bixe, bike meseleyek bîçûk, pirseke mafêni mirovan!

Eger em dest ji gotin û doza Kürdistanê û aîmanca mafê çarenûsiya gelê Kurd berdin, dê dewleta Tirk careke din di siyaseta xwe ya Lozanê ya destpêka sedsala buhûrî de bi serbikeve.

Eger rûvîyê me li ruyê dinê wek "Rûvîyê Kürdistanê" bimine, emê bi serkevin.

\*\*\*

Anekdotekî bîçûk ji bo cehaleta Yalçın Dogan:

Ew dibêje navê Kürdistanica UNDF ji ber xwe vê derxistiye, da ku welatê me perçê bikin. Vi navî UNDF ji ber xwe vê icat nekiriye. Lêkolînvanê Rûsi Sergey Satunin di destpêka sedsala buhûrî de ev nav lê kiriye û xistiye listeya navê Latinî. Yek ji, rûvîyê sor ne tenê li Kürdistanê dijî, li gelek deveren cihanê ev cüre rûvî heye û ev rûvî li gora herêmê têbinavkirin. *Vulpes vulpes* Kürdistanica yek ji van rûvîyê sor e ku li Kürdistanê hêla Serhêdê dijî. Listeya rûvîyê sor li jér e:

Navê rûvîyê sor: Cross fox (English), Renard (French), Renard roux (French), Rotfuchs (German)

Alternative species names (the second part of the binomial species names):

[Genus] abietorum; [Genus] acaa; [Genus] aegyptiacus; [Genus] alascensis; [Genus] alba; [Genus] algeriensis; [Genus] alopec; [Genus] alpherakyi; [Genus] alticola; [Genus] anadyrensis; [Genus] anatolica; [Genus] anubis; [Genus] arabica; [Genus] atlantica; [Genus] aurantioluteus; [Genus] bangsi; [Genus] barbarus; [Genus] beiringiana; [Genus] cascadiensis; [Genus] caucasica; [Genus] cinera; [Genus] communis; [Genus] crucigera; [Genus] daurica; [Genus] deletrix; [Genus] dolichocrania; [Genus] dorsalis; [Genus] eckloni; [Genus] flavescens; [Genus] fulvus; [Genus] griffithii; [Genus] harrimani; [Genus] himalaicus; [Genus] hoolei; [Genus] holi; [Genus] hypomelas; [Genus] ichnusae; [Genus] induetus; [Genus] jakutensis; [Genus] japonica; [Genus] kamtschadensis; [Genus] karagan; [Genus] kenaensis; [Genus] kiyomasai; [Genus] krimeamontana; [Genus] kurdistanica; [Genus] ladacensis; [Genus] leucopus; [Genus] lineatus; [Genus] lineiventer; [Genus] lutea; [Genus] macrourus; [Genus] melanogaster; [Genus] melanotus; [Genus] meridionalis; [Genus] montana; [Genus] necator; [Genus] nepalensis; [Genus] nigra; [Genus] nigro-argenteus; [Genus] nigrocaudatus; [Genus] niloticus; [Genus] ochroxantha; [Genus] palaestina; [Genus] peculiosa; [Genus] pennsylvanicus; [Genus] persicus; [Genus] pusilla; [Genus] regalis; [Genus] rubricosa; [Genus] schrencki; [Genus] silaceus; [Genus] sitkaensis; [Genus] splendens; [Genus] splendissima; [Genus] stepensis; [Genus] tobolica; [Genus] tschiliensis; [Genus] ussuriensis; [Genus] vajra; [Genus] variagatus; [Genus] vulgaris; [Genus] vulpecula;

## Emerîka û Sûriyê...siyasetmedarêne Rojavayê Kürdistanê li ku ne?

Rewez \*

**E**nçûmena Ewlekariya Navnetewî ya girêdayî Neteweyê yekbûyi bîryara hejmar 1559 wergirt û daxwaz kir ku Sûriyê hêzîn xwe ji Libnanê derxine. Sûriyê guh neda vê bîryarê. Piştre ji ew ji aliye oposîzyona Libnanê ve bi kuştina Serokwezîrê berê yê Libnanê Refiq Herîrî hate tawanbar kirin. Van her dû xalan rî li ber Emerîka vekirin ku ew bikaribe delîl û isbatên cinayetkariya rejîma Sûriyê kom bike û bide ser hev. Emerîka ev her dû belgenameyen girîng ji xistin nav delîlen alikariya ku Sûriyê pêşkeshî teroristen li İraqê dikir. Dewletên Yekbûyi yê Emerîka projeya rûxandina vê rejîmê ji bo pêşerojeke nézik daniye pêşîya xwe. Rejîma Sûriyê, bi isarkirina li ser pêkneanîna xala 1559 û kuştina Herîrî, dôstekî xwe yê pir mezin angî Dewleta Frensa ji, wenda kir. Dewleta Frensa iro li gel Emerîka di eniyekê de dijayedîya Sûriyê dike. Kartûbarê Sûriyê yê di dema dawî de, nişana wê yekê ye ku

ew dest ji pêkanîna pilanê xwe yê bi qirêj bernede. Ew naxwaze aramî li herêmê çêbîbe, ji bo ku temenê hukmê xwe yê dikatorî, li ser hîsabê gelên herêmê dirêj bike. Serhişîya Sûriyê şansekî mezîn da Emerîka ku ew pişgirîye ji tevayê welatên hevgirti yê Ewrûpa ji bo bîryarê li dijî Sûriyê bistîne. Sûriyê ji di vê navberê de ji bo berde-wamkîrîna siyaseta xwe ya cinayetkar, li gel Îranê bi navê „Peymana Stratêjik ya Bergiriya li pêş Emerîka“ peymanek çekir. Sûriyê bi vî kari weke ku kurd dibêjin, „eger ecèle bizînê were nanê şivan dixwe“, dawîya xwe nézikirî kir. Her wiha helwesta Emerîka bi hêzîtir kir û mafdarîyeke mezîn xiste destê wê ku ew bikaribe rejîma Sûriyê biherifine.

Partiyêni siyasi yê rojavayê Kürdistan! Hûn li kudera van guhertîn disekinin? Li gora şirovekarên siyasi yê li hundir û derveyî Sûriyê, diyar dibe ku hêzîn siyasi yê Rojavayê Kürdistanê ne xwedîye helwesteke wiha ne ku bikaribe bîbe bersiv ji bo guhertîn ku li herêmê çedîbin. Diyar e, bi

sedema pirsgirêkên xwe yê navxweyî heta niha ev rews bi awayekî baş şirove nekirine. Pêwîste ew, mijâ li pêş çavên xwe hilînîn. Mafê her mirovekî kurd heye ku ji wan pirsyar bike, ka ci pilan û amadekariyêne we hene ji bo hûn südeke baş ji vê pêşveçîna bi xêr li herêmê wergirin? Gelo hûn bi ci awahî vê gibûna di navbera Emerîka, Sûriyê û hevpeymanan de têxin xizmeta berjewendiyen gel? Gelo tu pilanê we ji bo hevkârîkirina li gel Emerîka hene? Pirs dikarin werin zêde kirin. Lî iro baştîrin wexte ji bo bi ci anîna wan daxwazên ku gelê me bi salane xebatê ji bo biserxistina wan dike. Baştîrin wexte ji bo gel ji wî aşê rejîmê yê cemidi rizgar bibe ku têde tê hêrandin. Werin! biherikin kolanan! dengê mezlûmiyeta gelê xwe zêdetir bi dînyayê bidin nasandin, ji ber ku iro hînêk hene ku piştevaniya we bikin û daxwazên we pîroz bikin. Werin! wî dîtarê tîrsê yê ku heta niha hatîye hûnandin, birûxînîn; ji ber ku wateya hebûnê, bi jiyanê ye û ne bi pejîrandina bindestiyê ye. Hêzîn siyase yê

Rojavayê Kürdistan! hûn li beramberi dîrokê û gelê xwe berpirsyar in!

(çavdîre siyasi) \*

INTERVIEW

XWEDEYE PEYMANEYE  
PEYAMA KURD VERAG  
PEYAMA KURD

THOMAS-MANN-STR. 22, D-1111 BERLIN / ALLEMAGNE  
Tél.: +49 (0)2381 18 60 55  
Fax: +49 (0)2381 18 60 55  
E-mail: +49 (0)2381 18 60 55  
WWW.PEYAMAKURD.COM  
INFO@PEYAMAKURD.COM

REDACTION  
KURDISTANICA JOURNAL  
Editor: Ozanek (OZENKE DAHIO)  
Design: Hakan Kara (DIAHANA)  
Production: Tuncay Kara (TUNCAY KARA)  
Kurdish: Kürdî (KURDÎ)  
Sorani Kurdish: SORANI  
Kurdish: KURD  
Dava Aşır, VİDÜS FÂLQ, ŞAHİN AŞIR, MURAT ÇALIK, HÜSEYİN DURMUŞ  
Münâde: Münâde, Güvenç, GÜVENÇ

PEYAMA KURD İ MALTEŞME DİREKTYÖVÜ KURDISTAN'IN TİCARETİ İLE İLGİLİ  
ÇEVİRİ ALTI: NEZMÂM Ü RASTVİYİBE VE DE SENASTORİYİNA BERHİYAN DE AZAD  
PEYAMA KURD NEZMÂM KU FETTEŞİ SAHİP O BERE LI ÇİYER İAN HATİF  
BİLAŞKIRIN, NAMEŞNE

## Fermo ji we re Komara Demokratik Fermo ji we re Tirkiyeya Ewrûpî



Li Istenbûlê polisên Tirk bi gaza-isotê êriş birin ser jinên ku 8ê Adarê pîroz dikirin, 29 kes jê jin 63 kes binçav kîrin. Di vê roja spî û roni de polisan can û bedenê jin û mîran reş û tarî kîrin. Polisên Tirk carek din ji caran îspatkîrin ku ew "gûrîn boz" in û zû bi zû nikarin dev ji harbuna xwe berdin, kedi bibin.

### Nûçe/analiz

Li Istenbûlê di 8ê Adarê de jinên ku 364 rojan di nav şert û mercen dijwar, beedalet û newekhev de dijin, xwestin roja ku diyari wan bûyê bi xweşî û dilgesi pîroz bikin. Jinên ku bi gotinan heval, yar, jin, xweşk û dayik binav dibin û xwedégiravî biqîmet dibin, beyaniya 8ê mehê ji herroj cudatir bi serbilindî û cilêñ xweyêñ ciwan-tir berê xwe dan kuçe û sikakêñ bajarê Istenbûlê da ku cejna xwe pîroz bikin. Ki dizane belkî hin-ekan ji wan hêvi dikir ku vê rojê, wê polisên Tirk en Komara Demokratik û namzete Yekitiya Ewrûpa ku bi xwe' xwedi dayik, jin, yar, xweşk û keçen delal in, bi gulêñ sor pêşwaziya wan bikin û şahiya wan pîroz bikin.

### Polisê Tirk ji dêvla gulêñ sor çopêñ reş diyari kir

Li Istenbûlê li taxa Beyazitê jin û mîr 500 kes ji fraksiyonê çep civiyan ser hevdu. Pankarta ku li ser "Jinêñ kedkar, li dijî kedxwariya cinsi, dagirkiriyê û siddetê têbikoşin" him balkêş bû û him



jî bi naveroka tékoşina jinan re li hevdu nedihat. Jin dagirkirina Iraçê protesto dîkin, lê ji aliye Tirkîyê, ïranê û Ereban ve dagirkirina Kurdistanê dipejirînin. Ev nebû! Li jinên ku "jin" in durûti nayê! Jinên ku "jin" in divê li dijî her dagirkiriyê rawestin; ne ku dagirkirya nebi dilê wan e şermezâr bikin û li himber a bi dil û menfeetên wan e bêdeng bimînîn, bi gotinek din bipejirînin.

Polisên Tirk ji jinan re daxwaza bidawianîna xwepêşandinê kir. Ji ber ku grûbê ev iqaż guhdar nekir, polis bi gaza isotê midaxale kir, bi çopêñ reş can û bedenê jin û mîran di vê roja spî de reşkirin û 63 kes girtin ku ji wan 29 kes jin in.

### Parlamena Ewrûpayê bêdeng nema

Dijwariya polisên Tirk di navbera Tirkîyê û Yekitiya Ewrûpayê de serêsi çekir. Serokê Parlamena Ewrûpayê Josep Borrell bi daxuya-niyekê li dijî êrişkariya polis nera-zibûna xwe nişan da. Borell eşkere kir ku midaxaleyâ li jinan hat kîrin dikare di pêvajoya hevdîtinêñ Tirkîyê bi Yekitiya Ewrûpa re astengiyan derxe holê. Ji aliye din ve serokê Komîsyona Karê Derve ya Parlementoya Ewrûpayê Elmar Brok got ku dibe hevdîtinêñ di 3ê Çiriya Pêşin de bi Tirkîyê re dest pê neke.



## Çêtirîn Diyariya 8ê Adarê Ji Kur-distanê Hat



Li piraniya welatê Rojhilata Navîn, kuştina jinan ji ber namûsê, dibe sedema sivikbûna cezeyê kujer û di aliye dadmendî de neheqîyeke mezîn li jinan dibe. Li Başûrê Kurdistanê, jinên Kurd, di encama xebateke demdirêj de, guhertineke giring di zagonê de çekirin. Li gora zagona nû cînayetên toreyî dîbin sedema wergirtina cezeyen giran. Her wiha, wê ji niha û pê ve zilamek nikaribe bi 2-3 jinan re bizewice. Mirovê ku ji xeynî zewaceke fermî, bi riya mehra İslâmî jineke din bîne, wê 5 salan cezeyê hepsê lê were birin. Beri vê zagonê, mafê zilamekî hebû ku bi mehra İslâmî li gel 4 jinan bizewice. Zilamê ku mehra fermî çeneke, divê 3 sal ceze bide ber çavê xwe. Zilamê ku bibe sedema xwekuştina (intihar) jinekê, wê 7 salan di girtigehê de bimîne. Ji bo jinêñ ku li derveyî malê dixebeitin jî zagonê giring derketin. Jin-en xebatkar wê di dema welidandinê de jî measê xwe bistin. Beri niha rojên welidandinê ji bo jinêñ xebatkar nedihatîn hesibandin û wan pereyêñ wan rojan nedistend.

Ji bo agahdariyê berfireh Peyama Kurd têkili li gel Xanim Ronak Raûf danî ku ew yek ji jinêñ çalak yê paras-tina mafê jinan tê ditin. Ronak Xanim, berpirsiyara Navenda Ronakbîrî û Ragihandinê ya Jinar û xwediya Îmtiyazî ya Rojnameya Rêwan e. Di derbarê guhertina zagonan û pêkanîna wan de ji bo rojnameya me wiha axifi:

"Weke tê zanîn berê eger zilamekî jinek bi sedema pirsgirêka namûsê bikuşa, cezeyê wî dihat sivik kîrin. Her wiha gelek zilam bê sebeb, cara sîyemîn û

çaremin dizewicin. Ji bo ku ev zagonê cezekirinê werin guhertin û pirzewaci ji holê rabe, me pir hewl da û me pirsgirêk xist rojeva Parlamento. Di encam de hinek zagon hatin guhertin. Li gora zagona nû, xala 59-61ê kuştina jinan bi ci sedemê dibe bela bibe, weke mîrkujiyê tê ditin û ceze kîrin. Her weha anîna jina diwemîn û sîyemîn ango pirjini ji hatîye qedexe kîrin. Eger jin ne mirî û nexweş be û eger ew bi xwe ne razî be, nabe ku mîr careke din bizewice. Em dibînin ku zagon bandoreke mezîn li ser civakê dike û ji dema ku ev zagona nû derketiye hejmara kuştina jinan ji ber namûsê, heta ji sedi 70î kêm bû ye. Li Silêmaniye ev zagon tê pêkanîn. Di zagona dabeşkirina mîratê de tu guhertin nehatin kîrin. Ji bo wê zagonê bi sedema bandora ola İslâmî me nikaribû emtişteki bikin. Disa di dema hevdûberdanê de zarok li cem bay dimînin. Ev yek nehat guhertin ji ber ku rewşa jinan ya aborî dest nade vê yekê. Jin-en herêmî bi piranî li derive naxebitin û hatina wan ya aborî tune ye. Weke tê zanîn bidest-xistina mafan û serbixwebûn pir girêdayî azadiya aborî ye. Cihê kîfxweşiyê ye ku ji bo jinêñ ku zext û zor li wan dibe, rîkxistina NGO (rîkxistina sîvîl) sitargehek bi navê ASUDE ava kîriye. Ez bixwe yek ji damezrênerê ASUDEye me. Di dawiya axaftina xwe de ez dixwazim bibêjim ku ev zagon bi hêsanî nehatin pejirandin. Ev yek encama xebata me ya demdirêj e. Em hêvi dikin ku di pêserojê de gelek guhertinê giring di berjewen-di jinan de çêbibin."



# Gidî gidî 8ê Adarê!

"Ew".

Niha jî kes bi hêsanî nikare bêje "keko jina te çawan e?" Gere bi awayek wusa bipirsin ku navê "jinê" tê de tunebe; wek "mali çawan in gelo?", zarok çawan in?, biçük çawan in? Yê ku hinek spesifik bixwaze bizane jî wek, "kebanîya malê çawan e?" dipirse.

Tıştek din balkêş; gava yek ji yekî dipirse ku çend zarokên wê/wî hene dibêje ku tenê kuran dihejmîrîn û keçikan na-xin nav hejmarêñ xwe de, mînak 3 kur û 5 keçik hebin jî, bersiva wan dibe, "3 kûrikên/zarokên min hene xulamê te bin".

Di gelek civatan de jin sembola jînê ye û pirozbâna wê qet nayê gengeşê kirin. Di nav civata me de jî wusa ye (!) her çiqaz em iro vê bi çawek tazî nebînin û qebûl nekin jî. Lî mirov vê fenomenê baştıriji bûyera "namûse" dibine.

**Namûs ci ye, ya kî ye, çawan e, çawan dibî xwedî namus, û çawan wunda diki?**

Çawan dixuyê ku namus tiştê heri girîng û heri piroz di jîyana mirovan da ye. Di hinek civatan de namûs û şeref wek hev in. Mirovek xwedî şexsiyet, durust, pak be, mirovek binamûs an jî bişref e. Berpirsiyarê namûsa wî/wê EW bixwe ye.

Di civata Kurdan de, namûs iro, angô jin e. Wek civatek bindestê dagerkeran, bê welat, bê ziman, bê kulturek standart, bê azadî, bi kortî bê tıştek e, Kurdeki xudanê bitenê malbata xwe ye. Mafê wî bitenê ew e, ku bibe berpirsiyarê malbata xwe. Malbata wî "jin" e. Rêvebirê malbatê jin e. Jin dayîka zarokên wî ye. Sembola zêde buna tovê wî ye. Berde-wamiya çand û zimanê babûkalên wî ye. Jin navenda malbatê ye.

Profesorê sosyoloji yê Fransiz Pierre Bordieu di nav xebata ta xwe ya Le sens de l'honneur de "namûse" wek "kapitala sembolik"diîne zimê. Kapitala sembolê

qebul kirin e, angô ew tiştâ ku di nav ci-vakek de giranbihâ û hêja hatîye qebul kirin, kapitala sembola wê civakê ye.

Namûs jî, ji me re iro bûye kapitala sembolika heri giring, û em dixwazin vê kapitalê biparêzin. Gelek caran jî bi awayekî nezanî mixabîn. Herkesek di eslê xwe de binamûs e. Namûs wek parçeyek bedena mirov e, mirov bi namûsa xwe ve tê dinê. Gava jina/keça li bin berpirsiyarê vî mirovî "şaşî" dike, namûsa vî kesî jî wunda dibe. Ev mirov edi "bênamus" e. Ew kesa nekare jina malbata xwe de biparêze ev kes xwedî namûs jî nine êdî. Mirovek sernîşûv e, lewiti ye, rûres e. Namûs bûyerek civaki ye angô kollektîv e. Heya ku kesen der-veyê malbatê bi "şaşî" ya vê jînê nehisa-bin, hêj ew namûs jî di ciyê xwe de ye, wunda nebûye.

**Namûsa wunda bu yî wê çawan peyda bibe? Wê çawan xwe bîşo? Serê xwe çawan rast bike?**

Gelek caran reçeteya vê ya heri baş bûye zewicandina xwedîye vê şâşıya mezin, lê carna pir kêm be jî, mirov rastê jînên pozbirî, porbirî jî tê (ew jina kû nebaşî kiriye heya mirinê wê cezaye xwe bikşînê wê herkesek bibîne ku ew jin ev şâşî kiri ye). Wê jinik jî alîyê mîrê xwe ve bê berdan, an jî rîya heri dawî, û heri trajîk bi kuştina jinikê/keçikê ve, mîrik wê namûsa xwe "pak" bike.

Bûyera namûsê bûye bandorek negativ li ser Tevgera Neteweya Kurdan jî, ji ber kû welatê dagirker vê hessasiyetê dizanîn, wek silahîk bikar diînin û gelek caran jî dîghêjin armanca xwe. Kesen li bin êşkencê de, "ser didin lê sir nadîn" ji bo ku jînên wan nekevin destê êşkencekeran de bê dilxwazî jî be sirê xwe bixwe dipiškîvin.

Tê zanîn ku dema keçek gerilla zindî an mirî dikeve destê polis û leşkerên tîrkan tê kontrol kirin ka ev keç bi mîrek re maye an nemaye, ku wek propaganda li dijê tevgerê bi kar bînin. Tecavuzen li ser jînîn di bin girtigehande, ne tenê wek êşkencê bi kar tînin lê mîna mesa-

jeck wek "min namûsa te lewitand" e ji bo mîrênd Kurdan e.

Ev dest û pîyênd Kurdan bêguman girê dide.

Madem jin hinde pîrozin çîma pîroz bûna wan tenê di 8ê Adaran de derdi-keve holê. Barê jîna Kurd giran e, gelek awayan ve bindestin, ol, civak, sazgehîn siyasi, kultur, sistem û hwd. hemû bi awayê xwe zordari li ser jînan dikin. Jinêñ ku hinek xwedi deng bûne bel-ke 10 car zêdetir xwe diwestîne an jî, ji bo xatirê navê jînan navâ wan de hebe tê bilind kirin. Ango navê jîna tîr-ji/sembolek ji bo rîxistinê modern (mînak Yekîtiyê Avrupayê) têbi kar anîn.

Tu ciyê tu mafekê wan tune ye. Lî disa jî xwe ne ji bo berjewendiyê xwe bi xwe re, ji bo berjewendiyê mala xwe, eşîreta xwe, gundê xwe, welatê xwe bi dilücan feda dike.

Bandora jînekê bê maf wê çawan li ser neteweyek mezin hebe?

Em baş dizanîn ku bingehê me, gundêne nin, bingehê gundan, malbatin, bingehê malbatan aşpejxane ye, û rîvebirê aşpejxanan jî bêguman jînin. Bingehê neteweyek çiqaz bi hêz be, netewe jî wê hinde serbiyeye. Neteweyek ku bingehê xwe angô "jîna" xwe wek kolebibîne ew, netewe bixwe jî bêguman wêkele bîmî, li ne.

Di 8ê Adarê de, danekî sorgulek tenê lîvîn wê ges dike. Ku haja jîna kurd bi giranbuhabûna xwe hebûya, wê vê gula sor paşve bidaya destê mîrê xwe û bigota "ev gul eger ji bo dilgeşbûna danekî ye, bira ev gul pêşkêş te be!"

**Gidi gidi 8ê Adarê! Em Eşînda 8ê Adar-an bijin da ku êdî nave jîn wek koleneyê guhîn, me, û em keçikan jînî bêxîn nav hejmarêñ zarokên xwe.**



Nesrin Rojkan

Dîsa 8ê Adarê hat û dîsa jî, jîn ji bo xêra vê rojê aktuel bûn. Wê jîn iro (ku şansê wan hebe) xwe bixemlinin ji bo roja xwe û nazî ya ku 364 rojan de pêk neanibûn, bikarin tam bikin.

Wê mîrik (eger hinek romantizmî mabe) jê rî gulek sor bîne, çayek wek xwîna kevroskê dem bike, û hinek jî gotinê hingvîni pêşkêşî jîna xwe bike ji bo ku iro 8ê Adarê ye. Roja jînan e. Jin...

Hinek kes dibêjîn ku peyva "jin" ê ji "jin" ê hatîye. Ango jîn, jîyan dide, (zayîn dike) û vê jîyanê, ji ber pîsîra xwe, xudan dike heya ev jîyan rabe ser lingêñ xwe.

Hinek kes şerm dikin bêjîn "jîna min" ji ber ku "jin" jê re wek "kole" tê. Ango wek mînak "jîna min, kola min". Di me-jîye wan de jîn qasê kolan, bindest e û bê maf e. Ji bo ku nebêjîn "jîna min/kola min" kurdêñ me yê modern ji jîna xwe re dibejîn "hevala min!".

Gava jînek bêjîn "mîrê min" wê ci bibe gelo? Jin jî şerîm dikin ku bêjîn "mîrê min". Lî ne ji bo ku mîrî dibe kolê wê, lewra, jîna ku bêjîn "mîrê min", jînek yan bê edeb e, yan sivik e, yan jî jînek poz-bilind e. Ango her sê gotin jî negatif in. Jînek giran û rîezdar gere bêjîn "babê za-rokêñ min" an "birayê Ehmo" an jî tenê

## Bibe aboneya/ê Peyama Kurd

Nav / Paşnav:

Navnîşan:

USA, Kanada û Australya

6 mehan: 70, €  
Salekê: 120, €

Welatêñ Yekîtiya Ewropa

6 mehan: 60,00 €  
Salekê: 90,00 €

Konto:

V. Efe/Peyama Kurd

IBAN: DE38 3804 0007 0100 7947 00

BIC: COBADEFFXXX

Almanya:

6 mehan: 50,00 €  
Salekê: 70,00 €

Commerzbank Bonn

V. Efe/Peyama Kurd  
Konto: 1007947  
BLZ: 38040007

Ji bo welatêñ din têkiliyê bi rojnameyê re deynin.

Peyama Kurd, Thomas-Mann-Str. 22, 53111 Bonn, Germany  
Tel.: +49 (228) 18 00 654 - 18 00 655, Faks: +49 (228) 18 00 656  
www.peyama-kurd.com, eMail: info@peyama-kurd.com



Afganistan - Pişti rejîma Taliban a li Afganistanê, cara yekem jînek bû wali. Çepêñ ku bi navê pêşverûtiyê li Iraqê û Afganistanê dijminatiya Amerika ji xwe re kirina mijara hebûn û tunebûnê bila guh û çavêñ xwe baş vekin. Habibe Surabî, ya ku heta çend sal berê ni-

## Li Afganistanê yekem jîna walî

Pişti rejîma Taliban a li Afganistanê, cara yekem jînek bû wali. Çepêñ ku bi navê pêşverûtiyê li Iraqê û Afganistanê dijminatiya Amerika ji xwe re kirina mijara hebûn û tunebûnê bila guh û çavêñ xwe baş vekin

karîbû rûyê xwe vekirâ, di 48 saliya xwe de bû waliyê eyaleta Bamyanê. Dayika 2 zarakan Surabî bi meji û mentaliteya welateki paşdemayı û baweriye kêm-cinsiyeti dibêje: „Li pişti her jîneke ser-keji mîrekî liberal heya” û bi berdewamî radigihîne, „Tayînkirina min aji bi vê wê wezifeyê ji jînên din re nê Nekir“ Surabî li dibêje ku ji tehdîdan natirse û dom dike, „Li vir xeyala herkesî ampûlek e, ya min jî“. Surabî di wezifeya xwe de berî her tişî anîna elektrîkê û asfaltkirina rê daniye pêşîya xwe.

# Serhildana Qamişlo



Qamislo.com

## Rêber Mihemed

**S**alek li ser Serhildana Qamislo re derbas bû , roj bi roj royê dijminê me reşir dibe, roj bi roj dijminên dijminê me geliktir dibin .

Belê ew Serhildana ji saha Futbolê destpêkirî, li hemî bajarên Kurdistana Sûriye gera , heya giheş şam û Helebê, cara pêşibû di Dîrûka Kurdistana Sûri de, tiştek wesa mezin bi hezara mirov dakevin caade û kolanen welêt , û ji zilm û zorê re bêjin na , ew jî isbatek bû ku milletê Kurd saxe û liser piya ye , tiştek gelek normale millet zilm û zorê qebûl nekin .

Berî salekê vî caxî , hestê netewî gelkî bilind bûn, ji ber destkeftiyê Kurda li Kurdistana Iraqlê, Rejîma Sûri ji wan hestê netewî gelkî gelkî tirsa û xwest çavê Kurda bişkîne, bi hêceta maçek Futbolê royê xwe yê hovane şanî millet da û çavşorîyek li milletê sîvil û bê guneh kir. Li Qamisloka evînê xwest kuştin û talankirina li Hemmayê kirin li Qamislo jî bikin , lê milletê Kurd li Sûriye nemerdî nekir û her bajarek Kurda bû Qamislo. Enya ( cebha ) serhidanê fireh bû û li hemî welatên di-

nyayê Kurda ev karê hovane protesto kirin, bi hezara Kurd hatin binçav kirin û gelek şêhid ketin, lê ji baweriyê xwe paş neketin. Heya Beshar El Essed li ser qenalê Tv na bêje Kurd beşek esasîne ji hebûna Sûri , tevlî ku berê hebûna me Kurda înak dikir . Em Kurd ne minetdarê Beshar El Essedin , em minetdarê şêhid, girtî û milletê xwe ne .

Sûri bi hezara qanûnên navnetewî yên mafê mirova imzekirine, gelek eyb û fihete li soz û bîryarêne xwe ne xwedî bin.

Gelek şerm û fihete ku rejîma Sûri girên Cûlan ji Cihuya re berdaye û Entakya û Iskenderun ji Tirkare berdaye û bêdeng maye, lê fehiltî û mîranîya xwe li ser serê milletek bindest û zeîf (Kurda) û yan jî li welatek bicûk û zeîf, wek Libnan dide xûyanî.

Serketin li hember zeifa şikandine, ne serketine .

Sersala we pîroz be, Qamislo, Efrîn û Kûban!

Sersala we pîroz be ey şêhidên qehremân!

Bi serbestî herin ferdewsê, li hêviya weye Sêx Seid, Qadi Mihemed û Barzan!

## Li navçeya „gurê boz“ cînayet



brîndar bû:

Li gora agahdariyan her du hevalan di trêmbêlek parkkirî de dest bi vexwarina alkolê kirin. Pişti demekê Bülbûlê ku li dawîyê rûniştiye ji Yeşilê ku li pêşîye rûniştiye daxwaza guhertina cîh dike. Ji ber ku Yeşil daxwaza Bülbûl qebûl nake di nav wan de minaqeya devkî dibe şer.

Serik yek ji wan navçeyan e ku xelkê wê nahêle Kurd lê bi cîh bibe. Ji nuha û çend salek berê xelkê wê navçeyê mezelê du gerillayên Kurd ku ji aliye eskerên Tirk ve li wir hatibûn şêhid kirin û veşartin, vekirin û termên du Kurdistana avêtin. Xeblkê navçê ji zarokan heta mezinan bi qîrînên ,gurê boz' diyar kirin ku ne zindî û ne jî mirî li navçeya xwe naxwazin Kurdistana bibînin.

Li navçeya Serik girêdayî bajarê Antalya pevçûna ðü , heval'an bi kuştina yekî ji wan bi dawî hat. Musa Yeşil û Mevlut Bülbûl ji ber ku li trêmbêlê de di koltixa pêşîye rûnin dest bi pevçûnê kirin û kér li hevdu kışandin. Pişti şerê du ,heval'an Bülbûl 29 salî ji ber kérên li sîng û zikê xwe xwar mir û Yeşil ji ling û milê xwe

## Carna xeyalê dayîken we, we ne wekî xwe dihêlin

Zeynel Abidin  
Kızılıaprak



Pêsiya erozyona axê bi tenê bend digire: lê mijar erozyona ramanî be, gelo pêsiya wê ci digire?

Aghahî... Vekolin...  
Vepirsîn... Li ser hinek  
prensîban da rik kirin...

Li dijî erozyona ramanî meriv dikare van tiştan û çend tiştên wekî vana bide pey hev. Gelek xwedan raman dibêjin, ku heke meriv hinde xwe bi van bixemiline dikare xwe li hemberî erozyona ramanî piparêze an jî zaiyatekê kem bide

Lê belê heke erozyon hertim li nasnameya we bixe wê çawa be?

Gelo bi rastî pêsiya erozyona nasnameyê ci digire?

Heke hûn li cografiyake wusa be ku meriv nasnameya jixwe bi zorê dikaribe bidestbixine û wê bidestbixe jî ji bo ku ew ji dest we here bi hezaran kemînên xayîn li pêsiya we hatibe danîn, wekî mînak hûn ji bajarekî li başûrê Kurdistan'a Tirkîyê bin?.. Vekî mînak hûn ji Semsûrê bin?.. Gelo ci li pêsiya erozyona nasnameya ve digire?.. Dibe ku hebe rê û rîbazên viya ya zanyari/civatnasî jî hebin. Lê ji bo viya tu tiş, hinde xiyala dayîka we bi tesîr nabe...

Hê xortbûm... Di bin bandûra ütopiyâyen ku gelek ji min mezintir û ji min qudrettir de bûm... Wê çaxê kengî riya me bi malê diket!.. Lê dîsa ji min mala me ya bana xwe bi xwelî û bi bexçe dikir... Bi piranî ji min hez ji sohpeta dayîka xwe dikir.

Ez bi Tirkî dipeyivîm, ji bo xatirê min heya ku ji wê dihat ew jî bi min re bi Tirkî dipeyivî.

Tirkiya wê ne hinde serketî bû. Ü bi serde jî hez ji axaftina bi Tirkî jî nedîkir. Lê li hemberî Kurdi qedexeyek neélankirî hebû di mala me de; û teví dayîka min Tirkî zimanê me yê malbatî bû di nav me da...

Wê jî bi gelek caran digot, "eman, zimanê min perçivî ber vî zimanî, ka gavêkê herim cem Zilxa cîranê me, piçek Kurdi bipeyivim, ku bila zimanê min vebe."

Diya min keça melê bû. Bi piranî ji, min hez ji sohpeta dayîka xwe dikir... Axaftinê min hinek ber bi propagan-

dayê ve diçû, lê dîsa jî dayîka min bi çavên dilovanî bala xwe dida min û guhê xwe dirêjî min dikir. Min qala sosyalîzmê dikir jê re, lê tênedigîhişt; min digot, "di siya sosyalîzmê de wê Kurd jî azad bin", vê demê çavên wê dibiriqiy...

Dema ku qala Kurdan derbaz dibû, di hundirê xwe de dia dikir û demek hustûyê xwe xwar dikir û xwe bixwe difikirî, Xuyabû ku ber bi bîranînên xwe ve diçû, ku qet min pê nedizanibû. Di wan deman da çavên wê tije dibûn. Demek şûnde jî serê xwe dihejand û stranek Kurdi dimirmirand, ku bi newayekî bi zorê dihat bîhistin.. û xwe li min dipêça, serê min dikir hembêza xwe, porê min mist dida... Di wan deman de ne xema wê bû, ku ez êdî bûme xorhekî mezin û bi siyasetê ve mijûl im. Ji bo wê ez hê tûtik bûm. Min li ber xwe nedida, ji ber ku min jixwe pir hez ji bêhna tena dayîka xwe dikir...

Ü piştre, serê min radikir li rûyê min mîzedikir; êdî histêr li çavên wê nedîma û pişti daqurtandina hîskîna xwe ya dawîyê, bi serê xwe yê bilind û wekî ku serekê bêje min, digot: "Tu madem ku doza maf û dadên Kurdan diki, tu cenevê yi"... Ü piştre jî, bi wê Tirkiya xwe ya şikestî digot, "kurê min, Kurd netewek pir mezlûm in. Tu zerarek wan negîhîştiye kesî, lê pir çile kışandine... Eve parastina mafên Kurdan heye ya... Kî parastina mafên Kurdan bike ciyê wî buhuşt e. Dev ji parastina mafên Kurdan bernede kurê min!..."

Berê min li ser kaxizên spî dinivîsand, niha jî li ser ekranê kompitûre dinivîsim... Lê dema ku li ser gelan/civatan/mirovan, hele ku li ser Kurdistana dinivîsim, berê li ser kaxizên min yên sipî, niha jî li ser ekranâ kompitura min suretê rûyê dayîka min dikeve ... Wê dibînin, dibîhîzim: Dibêje min "Kurê min", û dawîyê gotinê jî ez tînim bîra xwe...

Xiyalê wê tim li ber çavên min in û dema ku xiyalê wê tê ber çavên min, tiştek di gewriya min de dibe girêk, û pê dizanim ku ev sûret, ev xiyal, him nasnameyek daye min, û dûvre jî pêsiya windakirina wê nasnamê xitîmandiye... û pişti ku ez ji xiyala dayîka xwe dibim xwedî hêz, ez carek din difikirim:

"Ez dibêjim dijberî hemû erozyan benda herî baş, ew tiştên ku em ji pêşerojên xwe verdigirin û tînin in."

## Polîsê İstenbûlê endamê HAK-PARÊ Aydogan Înal tehdît dike

**İstenbûl** - Serokê HAK-PARÊ yê İstenbûlê Mustafa Aytaş bi daxuyaniyekê eşkere kir ku Polîsê İstenbûlê endamê wan Aydogan Înal tehdît dike.

Li Gora daxuyaniya Mustafa Aytaş hêzên tarî bi telefonan Aydogan Înal

tehdît dike û bi vî awayî dixwazin li ber kar û barê HAK-PARÊ astengîyan derxinîn.

Aydogan Înal li bajarê İstenbûlê endamê komita karger yê HAK-PARÊ ye.

## Qedexekirina kulturê barbarî ye!

Ömer ÖZMEN

**Q**edexekirina zimên û kulturê te qabûlê barbarizmê dike. Di ensiklopediya Ana Britanica de, barbarizm; weha tê tarîfîrinê: "Ji terefêr êrişkarê Rojhilatîyan ve talankirin û imhakirina kultur û şaristaniya Romayê û Bizansê ye."

Hefteye buhuri, Wezareta Dorhêlê û Daristanîya Tirkîyê, êrişê zaniyarîya zoolojiyê kir û navê çend heywanan, ji bo kû bi Kurdi û Ermenî ne qedexe kir.

Di dokumenten zoolojiyê yên girêdayî saziyên Yekîtiya Miletan de, navê du heywanen li Kurdistanê dijîn, rayedarê Tirk gelek aciz kirine û xewa wan daye revandinê. Dabeşkirina Tirkîye carek din xistiye rojevê. Ji bo wê metîrsiyê tedbir girtine û navê Roviyê sor, ku di literatora navnetewî de "Vulpes Vulpes Kürdistanica" û pezkoviyen bi navê "Ovis Armeniana" tê bikaranîn qedexe kirin.

Tê zanin, insan, heywan û nebat fenomenen zindî ne. Dema di xwezayê de cih digrin, li kîjan herêmê de bijîn, li gora kultura wê herêmê tê binavkirin. Ji bo pispor û zaniyaran ev tiş, ne tenê pêdiviya rîbazê zaniyari ye, di heman demê de tiştekî ehlaqîye ji.

Ji vir bist sal berê, ez li Vartoyê, di dermanxana hevalekî xwe da rûniştibûm. Hevalê minê dermanzan, ji nav dermanan quitiyek bijart û nişanî min da. Navê wî dermanî "DIRRIK" bû. Di herêma Serhedê de "DIRRIK" navê nebatekî şewatoke. Di nexweşiyen romatîzmal de tê bikaranîn. Ji xwe quitiya derman ji, "antî romatîzmal" bû. Wê demê heval, agahdarî da min ku li gora etikê tendurîtiyê, madeyê derman yên bingehîn,

li kîjan heremê hebin, li gora kultur û zimanê wê herêmê tê binavkirin. Bila xwendevan biborin, ez ditirsim li ser vê nivîsara min, Wezareta Tendaristîya Tirkîyê pê agahdarbe û navê dermanê "Dirrik" ji qedexe bike.

Di sedsala bîst û yekan de, rayedarê dewleta Tirk, qaşo hewl didin di prosesa xwe amedekariya Yekîtiya Ewrûpayê de xwe biguherînin, her diçê paşve dicin. Xuyaye mejîyê barbariyê bi hêsayı ji serê wan dernakeve. Pişti qedexekirina navê mirovan, navê bajaran û gundan, navê çiyan û baniyan, içar destê xwe dirêjî navê heywanan kirin.

Aleksander Soljenitsin, di romana xwe ya bi navê "Rojek Ivan Denisovî" de li ser dema totalitarizma Stalîn, bûyereke weha dînîvisîne:

Li Sibîryayê, 250 kes di kampa sirganan de, noktayekî destnîşan dîkin. Her roj saet di 12 an da, tîra rojê tê ser wê nokteyê. Li gora wê bûyerê dema nanxwarinê tespît dîkin. Rojek kaptanekî keştiyê dibe berpirsiyârê wan û weha bangî sirgunvana dike.

"ji vir û pêda tîra rojê, saet di yekê de tê ser nîşangehê".

Dema sirgunvan sedemên vê guhertina xwezayî dipirsin, Kaptan weha bersiv dide: "Polit Büroya Partiya Komunista Sovyetî biryara guhertinê girtiye.

Totalitarizma Tirk ji, biryara guhertina zaniyarîya zoolojiyê girtiye. Navê heywanen kûvî diguherîne.

Ev bûyer ji, destnîşan dike ku Tirkîye ne di réya Yekîtiya Ewrûpayê de dimeş. Di réya Polit Büroya Sovyetî de ye.

Vêca eger hinek bipirsin, çima nav hatîne guhertin, hûnê bêjin, rejîma Kemalist wisa biryar daye! Gotina Kurdistanica wan aciz kiriye, Tirkîye li ber jihevetinê ye!

## Rûreşiyek din!

**G**rûpek bi serokatiya arkeologê Ingiliz Dr Geoffrey Summers, li Tirkîye, bajarê Yozgatê, nehiya Sorgûnê, paytexta Rojava ya Împaratoriya Medya a bi navê "PTERIYA" dîtin. Lê dewleta Tirk ev du salin vê rastiyê vedişerîn û naxwazin ev rastî eşkere bibe. Em belgeya bi zimanê Ingilizi weke xwe diweşînin.

Capital city of ancient superpower discovered

By David Keys Archaeology Correspondent

26 October 2002

British archaeologists have discovered a capital city of one of the ancient world's most mysterious superpowers.

The metropolis, covering more than a square mile, was the main western administrative centre of the ancient Median Empire, a vast Middle Eastern imperial state which flourished in the first half of the 6th century BC between the fall of the Assyrian empire and the rise of Persia.

The discovery reveals the sheer scale of the threat which would soon be posed to Europe by the ancient Middle East. For the Medes' westward ambitions led di-

rectly to the invasion of Greece in the early 5th century BC by their imperial heirs, the Persians.

The archaeologists, led by Dr Geoffrey Summers, found the Medes built their western capital, Pteria, on conquered land near the border of their empire. The metropolis was a huge citadel on a 5000ft mountain near what is now the Turkish town of Sorgun.

It had four miles of massive stone walls and hundreds of defensive towers. Seven monumental gateways and hundreds of buildings, including an imperial palace, have been found. But not one hole has been excavated. Dr Summers' team used remote sensing and geophysical survey techniques to map the metropolis to an accuracy of 10 centimetres

## Paktek ket nav dîrokê (Pakta Bexdayê-1955)



Adnan Menderes - Tirkîye



Nûri Seîd - Iraq

### Ali Haydar Koç

**B**i piştigiriya Britanya, Fransa û Yekîtiya Sovyetî li Rojhilata navîn gelek dewlet hatin damezirandin. Dewleten ku Kurdistan di nav xwe de parve kirin yên wek Komara Tirkîyê, Sûriye, Iraq û Iran bi alikariya van dewletan derketin holê û bi vî awayî di herêmek dewlemend ê petrolê de dewletek ku dikare ji bo wan bibe telûke li ser bingehê hevbeş yên aborî, leşkerî û siyasi bi hewldanen diplomatik yên navnetewî asteng kirin.

Dewleten ku li Rojhilata navîn erden Kurdistan dagirkirin, di sedsala 20an de bi hevdu re her hevkariyê kirin. Kurd ji her li welatê xwe li dijî şideta dagirkir rawestiya, li dijî Pan-Arabîzmê, Pan-Turkîzmê û pan faşîzmê sekinin. Li Rojhilata navîn roj bi roj bi graftbûna pirsa Kurdî di helwestenî siyasi û diplomatik ên dewleten mezin de damezirandina dewleta Kurd zahmet dikir/ zor dike û bi taybetî li Başûrê Kurdistanê gava hat famkirin ku dewleta Kurd pêk nayê, Kurdish tucarî ji daxwazên xwe yên vekirina dibistanen Kurdi, li herêmên ku piranî bi Kurdi diaxivin, Kurdi bibe zimanê resmi bernedan.

Dewleten ku sînorên Kurd dagirkirin ji bo ku netewa Kurd dîbin kontrola xwe de bigirin ji destpêka sedsala 20an, di demen cûrbecûr de bi hewldanen diplomatik dinav xwe de peyman û paktîmze kirine.

Di dîroka diplomasiya Kurd de, ji gelek peymanen ku dewleten dagirkir di nav xwe de li dijî menfaatên gelê Kurd ji berî niha 50 sal berê di navbera Tirkîyê û Iraqê de hatiye imzekirin. Di 24ê Sibata sala 1955an de peymanî hevkariya beramber a di navbera Tirkîyê û Iraqê de hatiye morkirin. Ev peyman berde-wama Peymana Sad-Abad ku di sala 1937an de hatibû imzekirin, ji tê qebûl kirin.

Li ser navê Serokkomarê Komara Tirkîyê Adnan Menderes û Fuat Köprülü, li ser navê Qralê Iraqê ji Nuri Es Said û Burhanettin Basayan imze kirin.

Du xalêne peymanê wek ku hene li jêr didim.

1. Terefêr girêdayî ji bo ewlekari û parastina xwe li gorî qanûna Milletên Yekbûyi, xala 51emîn wê hevkariyê bikin. Ji bo pêkanîna vê hevkariyê tedbirê ku biryara stendinê bidin, dibe ku di nav xwe de bibe mijara peymanen taybetî.
2. Pişti ku ev peyman ket meriyetê berpirsîn bilind yên terefân ji bo pêkanîn û pêkhatina hevkariya ku di xala 1em de eşkere kiriye, wê tedbirê pêwist tespît bikin. Ev tedbir pişti ku ji aliye hi-

kümeten her du terefan hat pejirandin wê derhal bê hesab kirin ku ketiye tetbiqê.

Roja ku Peymana Baxdatê hat imzekirin, du nameyên nêtpak ku beramber pesnê hevdu dîkin hatiye nivîsandin.

Paşdetir Amerika, Britanya, Pakistan û Iran ji besdarî Peymana Baxdatê bûn û qebûl kirin.

Armanca bingehîn ya dewleten dagirkir yê ku Peymana Bexdayê imze kirin, bi hevkariyek beramber rîlibergirtina rîexistiniya netewî ya ku li her perçê

Kurdistanê bilind dibû. Tirkîye, Iran û Iraq biryara ku bi hevbeş erîşî tevgera Kurd bikin ji girtibûn. Bi vê girêdayî Iran bi qeweta ku ji Peymana Bexdayê distîne di 4ê Sibata sala 1956an de li dijî herêmên Kurd yên ku di bin dagirya wê de bû, erîş kir. Li Iraqê hikûme ta Nuri Said ji di çarçoveya Peymana Bexdayê de ji bo ji holêrakirina Kurdish çûbû alikariya şahê Iranê. Her wiha pişti Peymana Bexdayê nameya serokkomarê Tirkîyê Adnan Menderes a ku bi dizî ji serokdewletê Israîlê re nivîsand û lodgehîn eskeri yên ku li Kurdistanê dikir, di dîroka Kurd de bûyeren ku tê zanîn in.

Bi kurtayî Peymana Bexdayê 50 sal berê imheya netewa Kurd yedihewand. Tam pişti 50 sal ev peymanî li dijî mirrovatiyê bi temamî hikûma xwe winda kiriye û tevî dîrokê bûye.

Niha Tirkîye, Iran û Sûriye di mijara Kurdistanê de û ji bo ku damezirandina dewleta Kurd asteng bikin di nav xwe de hevditînên dizî pêktinîn û peymanan çê dîkin. Ev helwestenî siyasi bi siyaseta Amerika ya li Rojhilata navîn li hevdu nahe. Kurd her ku di warê yekîtiya netewî de bihez dibe, dikare bê texmîkirin ku politikaya van dewletan a ku li ser bingehî şideta militârîzmê ye, wê vala derkeve.

Ji aliye dîroknasan, a girêng ew e ku gelo hevditînên dizî yên van peymanan wê rojekê bîdestkeve û bibe mijara lêpirsînê? Mesele, di arşîvên Bexdayê de iro bîdestxistina van belgeyan ne geleki dijwar e, wezifeyek mezin dikeve ser milen dîroknasen Kurd en ku bi zimanê Erebî û Ingilizi dizanîn. Eger belgeyan li Iraqê bén dîtin, wê gelek bûyeren politik en ku piraniya wan ji aliye Tirkîye, Iran û Sûriye ve li himberi Kurdish lidarxitin, derkeve holê. Arşîvên Bexdayê li benda dîroknasen Kurd en ku bi Erebî û Ingilizi dizanîn. Her ku damezirandina dewleta Kurdistan nêzîk dibe, dawiya peyman û paktêne wek peymanî Bexdayê ku imhakirina Kurdish danîne pêşîya xwe, nêzîk dibe.

# Namûs û kuştina jinkê ji ber namûsê



## Dewleta Elî

Babetê namûsê babetekê Bpir giring û dwîr û dirêje, Bawernakem bi berperekî, ne jî bi duwa, derheq derkevîn, lê em jî dê bizavê keyn hinekî diyar bikeyn. Bo têgehiştina vî babetî, pêtiviye em têgeha şkandina namûsê bi dirustî bîzanîn û bî rengekê zanistî û waqi'i li ser egerêt serekî, yêt ku jinkê digehînin vê arêşê, rawestîn. Her çende ev babe te tim bi azadiyê ve girêdaye, nexusme têgehiştina azadiyê bi rengekê xellet, ji layê zelamî û jinkê ve, lê pa ji ber ku dê babet dirêj bît, lewra ya baştir ewe ku her yek bitenê bîhete niyasîn. şkandina namûsê ne ewe ku zelamek û jinkek (yêt

ku bê hevgiyan, yan jî kurek û kiçek) bi evîneka paqij û li dwîf şerîtetê olê xwe( kijan olî bit) bigehne hev wek jin û mîr, lê şkandina namûsê ewe ku ev tişte dwîri şerîti rwibidet. Li dwîf lêkolînêt meydânî yêt ku ji layê bispor û zana û rîkêt râ gehandinê têne çekirin û danûstandinêt rojane û têkeftinê digel gelek xudan problêma, wesa diyare ku hinek ji egerêt arêşa şkandina namûsê evene:

1. Zordarî û bindestî û givaştin.
2. piştguhvehavétina jinkê ji layê malê ve.
3. berdana hefsarê her kesî li bin alayê azadiyê.
4. windabûna evînê û êmnahîyê.
5. tolvekirin.
6. têrkirna hezêt cinsî û maddî.
7. dirustkirna tirazîya nefsi.

Ji ber cudahiya di nav bera ci-

vaka me û i'rf û e'detêt me û ji ber têgehiştina me ya berteng bo azadiyê û li dwîf hizreka xellet û tirsa windabûnê, nexasme, windabûna jinkê û windabûna kultor û ol û rewîsta, gelek daykû bab û bira û zelam hene givaştineka mezin li jinkê di ken û hemî bizav û livînêt wê di êxne bin kontrolê da. Her-wesa havêtina jinkê paş guh ve, ji layê dayk û baba û zelamî ve û ya pêtir kartêker ewe, dema ji layê zelamî xwe ve tête ihmalkirin, ji ber ku jinik bi xweristiya xwe ve, her wesa saykoli-jiya jinkê wesa heskîriye, ku ew bingehê evînê bît, hest nazik bit, her dem guhê wê yê li axiftineka evînê, peyveka xwes ku kesek jêra bêjît û bawerîyê bidetê û hesta wê ya jinîniyê têr biket û dema evî tiştî li cem dayk û baba yan jî zelamî xwe nebînît, hinek cara, hinek jinik hene dê vê xerizê bi rîkeka dî tîrken. Eve jî ne kartêkertire ji hindê dema mal yan zelam jinkê, yan jî her kesekî dî malê da, serberdayî diket, weku dibejin hefsarê wî berdidet, chi pis û pi-syar li ser hatin û çûn û livînêt wî nebîn, evca ya bê lomeye, ci ya diket biket. Her wesa gelek mal di pir problêmin ji ber gelek egerêt nezanîna rîvebir-na jiyanê, valatîyek di navbera wan da çedîbit, kesê wext û zewq nabît ku di gel heyjînê xwe yan keça xwe yan kurê xwe, rwînît û danustandinê biket û problêmêt xwe çareserbiken. Jiyan di van tuxme mala da, dibite tiştekê rotinî, vala ji êmnahî û evînê, hinek cara di gehîte jêkvebûna jin û mîra, evca chi kicha malê bît yan jî

jinka malê bît û hetta zelam, cihêlê malê, hinek cara dê li dervey malê bo xwe li evînê û êmnahîyê gerhît. Xiyaneta zelamî bo jinkê, kartêkirneka mezin lê diket, ewî demî hinek jinik hene, dê her wê rîkê di gel zelamî xwe bikar ûnît, da ku tolêt xwe jê veket, yan jî bawerî bi xwe û civakê namînît, û wesa hizir diket ku mirovê şerîf û paqij cihê wî di civakê da nîne. yan jî da ku tirazîya xwe dirust ket, ji ber ku xiyanet şkestineka mezin li cem jinkê peyda diket û kesatiya wê lawaz diket û bawerîya wê dihejînît. Bêhalîya malê û bê xudanî û muî'wîzî, hinek cara jinkê neçar diken ku berê xwe bidete vê rîkê da ku parîyê nanî peyda biket. Her wesa bara pêtir ji jinka zordarî lê tête kirin, bi seda kîchêt ciwan û bê gunneh yêt di gewera hinek nefş kêm û bê wijdana da, çûn û jiyanâ xwe ji dest daye, her ewan bê wijdana, pişikdarî di kuştina wan da kirîye û serbest bi dilê xwe dileyizîn. Gelek kîchêt ciwan ji ber evîneka paqij û bê gunneh serê xwe yê danay. Eve hinek egerêt şkandina namûsê bûn bi rengekê giştî, ne bitaybet bo jinka kurd, lê li gişt civakêt ku ev problême lê peyda dîbin, gelek egerêt di jî hene. Ya giring ne hijimara van egera ye, lê ya giring ewe, ka çawa em li despêkê rîkê xweşnekeyn ku ev problême peyda bibin heta digehne mesela namûsê, da ku serê xwe bi chareserkirnê ve ne eşînîn. Ya hejî gotinê ewe ku, şkandina namûsê nebes jinik pê radibît, lê zelam jî yê pişkdare têda. Gelek tolaz û zelam hene, he-

valât jin yêt heyn û eger jinika nîva wê kirba ya ku zelam di-ken, da rewşa jinka geleg xirab bît. Çima dema dibe mesela namûsê, bitinê berê me hemîya yê li jinkê û kuştina wê dibîte dermanê hemî derda, lê zelam yê dûre ji qesasê, ji ber ku ew "kure ser tiraşê" dikarît her tiştî biket?. panê ew jî kurê welatekî ye, berî ku kurê malekê bit, bavê hinek zaroka ye, yan jî malxoyê malekê ye, panê eve jî serçemandine û şermizarîye. Dema zelam xelet dibit, bi axifinekê tête, efükirin ((ez xelet bûm û ez beşerim û cu beşer nînin xelet nebin), lê ji bo jinkê ci u'zir nînin, her weku ew jî ne mirove. Merem ne ewe ku jinik jî bila ya serberdayî bît û ci diket biket, ne jî hevrikîyê digel zelamî biket, nexê ne jinka me wê li ser xwe qebûl diket, ne jî rewiş û titâlêt me wedibêjin, lê ya qenc ewe, em di heqanî bin û bi chavê mirovahyê li herduka binêrin, bîzanîn ku jinik jî mirove wek zelamî, xwe bavêjîne nav êş û nexweşiyêt jinkê jî, destê xwe bi serî da bînîn û evîn û êminahîyê bi-deynê, da ku nekevîte xeletiya û heger keftê, singekê berfireh bibînît, kesekê bawerîyê bibînît da ku eşâ xwe jêra bêjît û derdê xwe derman biket. Xwe nêzikî zarokêt xwe bikeyn û jêra bîbîne heval, wextê xwe bideynê, da bi piş bin û bikarin ser pêt xwe rawestîn. Bîzanîn ka dê çawa bawerîyê di nefsa jinkê da çinîn û têgeha dirust ya azadiyê, li dwîf me û kultore me, bo diyarkeyn, da ku bîzanît dê çawa xwe parêzit û her di wî demî da, dê ya azad jî bît, eve tiştekê giringe bo me nexusme di vê qûnaxa milletê me niho têda dîborît, qûnaxa bicihîna-na dîmukrasiyetê, ji ber ku jinik berê bînyatî ye di avakirna her milletekî da, û eger raste em dîmuqratxaz bin û me bî-vêt milletekê pêşkeftî avakeyn, divêt berî her tiştî em bingehê dîmukrasiyetê dirust danîn, bi-hayê jinê û giringya wê bîzanîn û eger ne hemîye, divêt hinekê jî mafê wê bideynê. Em wek kurd li derveyî welatî, bîzavê bikeyn tirazîyê dirust bikeyn nav bera xwe û van welata, nabêjim dest ji hemî tiştâ berdeyn, lê malêt kurda (dezgehet rewşenbirî) bo jinka û problêmêt wan vekeyn, berî zanînê ve biçin û jinka kurd berî zanînê û pêşkeftinê ve paldeyn, jinik û zarokêt xwe bi rengekê pêtir dimuqratî berdeyne nav qada jiyanê da û bawerîyê di giyan û mejiyê wan da biçinîn, dîmuqratîyet hemî pêşkeftina tînit. Kuştina jinkê ci mifay nadet, gunneheka mezine ci diyanet qebûl naken, bi tenê dilsotine, malxirabkirne, paşkeftine.

**STAR**

● DÖNER PRODUKTION  
● LEBENSMITTEL  
● VERPACKUNG  
● GETRÄNKE  
● GERÄTE

## GASTRONOMIE HANDEL

Tevi 300 celeb male xwe di xizmeta we deye!

- HÄHNCHEN-DÖNER
- PUTEN-DÖNER
- MIX (HÄHN-PUTEN)
- KALB (GEHACKT)

- Penir • Thunfisch • Champignons • Schinken
- Salami • Paprika Streifen • geschälte Tomaten
- Pizza Sauce • Peperoni • Pizza Box • Pommes
- Alufolie • Essig • Salz

**ABHOLMARKTPREIS**

Öffnungszeit: 08:30 - 18:00 Uhr

|                                       |       |
|---------------------------------------|-------|
| Pizza Käse-Gouda (%48):               | 3,09  |
| Thunfisch-Dose (2,65 gr.) LA PERLA:   | 4,49  |
| Puma Feta Rot (20kg. - Netto 16 kg.): | 39,99 |
| Essig (10lt.-%5):                     | 4,99  |
| Salz (10kg.-Eimer):                   | 5,50  |
| Mayo Hamker-(10kg-Eimer):             | 11,99 |
| Ketchup Hamker- (10kg.-Eimer):        | 11,49 |
| Pommes (10 kg. Karton-4x 2,5 kg.):    | 6,99  |
| Schinken (kg. Preis):                 | 1,89  |
| Putenschinken (kg. Preis):            | 4,49  |
| Salamî (kg. Preis):                   | 4,19  |

|                        | €     |
|------------------------|-------|
| Pizza Box: 20x20x3:    | 0,071 |
| Pizza Box: 24x24x3:    | 0,083 |
| Pizza Box: 28x28x3:    | 0,10  |
| Pizza Box: 26x26x4,5:  | 0,10  |
| Pizza Box: 28x28x4,5:  | 0,111 |
| Hamburger Box:         | 0,03  |
| Menüteller:            | 0,10  |
| Alufolie (1500x30 cm): | 4,75  |

Not: Yen ku male xwe bi xwe biven di %7 erzani heye!

OFIRMA STAR KALITE YE!  
OFIRMA STAR ERZANIYE!  
OFIRMA STAR QASI TELEFONEKE NEZI WE YE!

Adrese: Windelsbleicher Str. 180  
33659 Bielefeld  
Tel.: 0521/ 5227366-77  
Fax: 0521/ 5227388  
Mobil: 01797805900

## Li ser azadiya jinan çend gotin!

**Afife Evîn Çîçek**

Ez dixwazim hinek tiştên derveyî rîzîkê bêjim.

Em bi "rojên taybeti" dest-pê bikin...

Rojêن jinan, rojêن karke-ran, rojêن zarakan, rojêن dayikan, rojêن mafêن mirovan.. Hêmî ji ji bo yên tên perçiqandin hatine diyarkirin.

Ji bo kêşeyên beşen civatî yên ku tên perçiqandin re rojekî taybeti tê diyar-kirin û di wê rojê de gengeşî û çalakî li ser kêşeyên wan tê kirin.

Bê guman ev tiştîkî gelek baş e.

Lê dîsan ji di binê viya de tişteke veşartî heye ku meriv pê aciz dibe. Nizanîm hûn çawa difikirin, li gorî fikrê min, wekî ku di viya de maneyek piçûkkirî ji heye. Ev kêse, ne ew kêşeyên ku mirov wan bêxe di rojekê de... Du re hersal eyñî tişt, eyñî gotin... Du re bivê nevê kêse tên bîrkirin. Ev kêse kêşeyên civakî ya herî mezîn in, divê tim di rojevêde bin û ji bo çareserkirina van kêşeyan çalakiyên mezîn bêîn kirin. Nizanîm gelo ez şâş im?..

\*\*\*

Rast e, jin tên perçiqandin. Lê hemû jin wekî hev û qasî hev nayêne perçiqandin.

Jin wekî sinif, ol, netewe, nîjad ji hev cûda dibin û ji ber van sedeman jî, jin



ne wekî hev û ne qasî hev tê perçiqandin. Gelo em dikarin bêjîn jineke ji netewa serdest û jineke ji netewa bindest wekî hev û qasî hev diperçiqin. Ya didoyan, gelo em dikarin bêjîn di perçiqandina jinênetewa bindest de, "direkt" an "indirekt" rola jinênetewa serdest ji nîne?.. Em dikarin her tiştî têxin hustûyê mîran?..

Jinêneteweyen serdest ku dibêjîn "em mafêن jinan diparêzin", çîqas xwe nêzî jinêneteweyen bindest dibînin û dijî zilmê ku li wan tên kirin derdikevin?.. Dema şer de esker û polêsên tîrkan tecawîzê jinênetewa Kûrd kirin. Geleki wan jinan serî li dadgehê xistin. Çend rîxistinê jinênetewa Tîrkan li wan xwedî derketin?.. Çend jinênetewa Tîrkan ji bo van jinênetewa Kûrd yên hatine tecawîzkirin çalakî çekirin?..

\*\*\*

Tiştî ku ez qet jê fam nakim ev e...

Çima ev roja jinan bi tenê ji aliyê jinan tê bîranîn. Kêse di navbera jin û mîran de ye. Rast e. Lê em dikarin bêjîn hemû mîr súcdar in?.. Divê ev kêse di navbera jin û mîran de bê gengeşekirin û çareserkirin. Ji bo wiya jî, divê em ne bitena serê xwe, bi harîkariya mîran û bi wan re vê kêşeyê çareser bikin.

Em dikarin gelek tiştî din ji bêjîn. Emê hê gelek rojê jinan bi hev re bîrbînin. Gotinê mayî bila bîmînin ji bo rojê mayî. Bîmînin di xweşiyê de... .


## Washington Times: Tîrkiyê madalya zêrîn heq dike!



Rojnameya The Washington Times ku bi nêzîkayiya xweya bi rêvebiriya Bush ve tê naskirin, nîvîsand ku Tîrkiyê bi dijîtiya xweya li himberî Amerika re madalya zêrîn heq dike. Di nûçey-

ek ku bi îmzeya Arnaud de Borchgrave hatîye nîvîsandin tê gotin: "Di navbera axavtinê Usa-me bin Ladîn ku ji İlona 2001an û virde di 19 kaseten deng û video de belav bûye û nîvîsarên hin nîvîskarên Tîrkan de dîtina ferqekê geleki zor e". Nîvîskar radîgihîne ku bi hatîna Erdogan re pêwendiyê Amerika û Tîrkiyê roj bi roj bêtir xirab bûye. Borchgrave eşkere dike ku "Paranoja Tîrkan" şîkîn ku Amerika dixwaze Kurdistane dewlemed a petrolê damezirine, xwedî dike.

**Gafur Can**



Nisêbin 1966 - Şîrnex 02.03.2005

Ji alî dewleta Tîrkan ve hat şehîdkirin. Bila serê malbatâ wî gelê Kurd Sax be.

**Yılmaz Buldan  
(Cîlo Gewer)**



Gewer 1985 - Bagok 02.03.2005

Ji alî dewleta Tîrkan ve hat şehîdkirin. Bila serê malbatâ wî gelê Kurd Sax be.

**Em serê xwe li ber giyanê pak û rewanê şehîda nemir, canfedâ û nîşana qehremaniya Jina Kurd Leyla Qasim ditewînîn.**



13.03.1974

**Dengê huner û hestê netewî, hunermendê nemir**



**Mihemed Şêxo  
(1948 - 09.03.1989)**

Di dilê her Kurdeki welatperwer de diji

## Aqîbeta Lazan

**Lokman Polat**

Xwedê eqîbeta Lazan neyne serê tu neteweyî. Laz neTîrkan in, xelkekî din in. Lê, dewleta Kemalist wan wisa asîmîle kiriye ku, êdi doza heqê xwe yên netewî û demokratik nakin. Zimanê Lazan bi serê xwe zimanekî, lê ji bo ku Laz wî zimanî napeyivin ew ziman berbi wendabûn ve diçe.



Li anadoliyê û Kurdistanê cil gelên cuda hene. Ji xeynî Kûrdan yek gelekî din heta niha doza heqê xwe yên gelêri/ netewî nekiriye. Dewleta Kemalist wan asîmîle kiriye, helandiye û êdî piraniya wan gelan di gel ku netirkîn jî, xwe Tîrkan dihesibînin. Dewleta Kemalist bi çova zorê ci kir û nekir nikaribû Kûrdan wekî Lazan asîmîle bike ku dev ji doza xwe ya netewî berdin. Ordiya Kemalist a hov-barbar- li Kurdistanê qetliaman pêk anî, lêbelê dîsa jî nikaribû bigije armanca xwe ya asîmîlasyonê.

Dewleta Kemalist heşte salan metoda zorê û asîmîlasyonê ceriband, bi ser neket, vêca dixwaze bi metodeke din, bi destê Kûrdan Kûrdan bike wekî Lazan anku eqîbeta Lazan bîne serê Kûrdan. Aqîbeta Lazan ev e ku; Kûrd jî doza heqê xwe yên netewî nekin. Ji bo gel û welatê xwe tu statuyekê neparêzin. Bi Tîrkan biaxîfîn û bi Tîrkan binivîsin. Ziman û edebiyata Tîrkan dewlemed bikin.


Laz ji sedsalan ve li ser axa xwe anku li derdora behra reş dijin. Boşnak di nav cil, pênce salan de ji balkanî koç kirin û hatîn Tîrkiyê û bi piranî li derdora bajarên Stanbul, Bursa û Izmirê kom bûn.

**Kurdperwerê hêja  
Mela Cehfer çû ser  
dilovaniya xwe**

Endamê Partiya Dimoqrata Kurdistana Tîrkiyê Mela Cehferê Tetwani çû ser dilovaniya xwe.

Mela Cehfer ji xorhaniya xwe û heta

koça xwe di riya gel û welatê xwe de xizmetên bêhempa kir, ji civat û derûdora xwe re bû minaka Kurdperwerî û wela-theziyê. Emê xebat û kedî Mela Cehfer û hemû kedkar û nemîren doza Kûrd û Kurdistanê jîbir nekin. Bila serê malbatâ wî, dost û hogirên wî û serê gelê Kurd sax be



## Jinê kurd bi hilgirtina çekan û derketina serê çiyan gaveke pir balkêş avêtin

Niviskar û siyasetmedarê kurd Nejdet Buldan di pirtûka xwe ya dawî de bala civakê dikşîne ser pirsgirêkeke taybet. Buldan gotiye "Ger mirov di PKK de Jin be" û gotin daye jinê ku bi salan di nava PKK de mane. Nejdet Buldan pirsî ye û ew axivine. Di vê heppevînê de jî me pirsî û birêz Buldan axivî.

û zanebûnê jî di çarçoveya mejiyê serok û birêvebirên xwe de şirove kirine û nedîtine ku dinyayeke din jî heye. Jinê di nava PKK de, kêm caran ji aliye serokê xwe, birêvebir û fermandarên xwe ve weke jin hatine dîtin û dema ku dîtine jî ji bo hinek berjewendiyen dîtine.

*Mirov dikare bibêje ku PKK bi rîveki-rina li hemberî jinan bareki zêdeyi taqeta xwe hilgirt û piştre nema ji bin derket û bi taybeti serokê PKK jin ji bo mezzinkirina hêza xwe ya şexsi bikar anîn?*

Kurdan sudeke mezin ji tekoşina PKK wergirtin. Çiqas ziyan dîtine ew meseleyeke cuda ye. Pir tişti jî hatine bidest xistin. Gotina ku dibêjin, PKK jin dane pêş û piştre ji bin kontrola wê derketin, di heppevînan de jî hatiye gotin, lê ez di wir de bi guman im. Di PKK de her tişti bi ferman û nexşeyen serokê PKK tê meşandin, here here, were were, razê razê, rabe rabe. Eger wi got, tu heyî wê demê tu heyî. Bibêje tu tuneyî, wê demê tu tuneyî. Ev mekanîzma bi destê serokê PKK hatiye çekirin û heta niha jî birêve diçe. Ez nikarim weki psikolog an jî civaknaseki biaxivim, lê ez dikarim bibêjin ku serokê PKK hinek xalêñ zeif di civakê de dîtine û baş bikar anîne. Yek jê meseleya meyla civakê ya li ser şerî û nîşandana hêzê ye û ya din jî pirsgirêja jina ye. Serokê PKK payeyek bilind daye wan jinê ku di nava civakê de bi tişteki nedihatîn hesibandin û ev yek ji bo berjewendiya xwe bikar anîne. Jin jî bi vê payebilindiya ku ji serokê PKK wergirtine, serxwes bûne û ji ser hemdê xwe çûne.

*We gotiye di derbarê jinê şervan, kuştî, girtî û birîndar de tu istadistîkîn rast tune ne, gelo hun nafîkirin di dema pêş de dest bavêjin kareki wiha û li vê meselê bikolin? Ji bo derxistina van rastian kurd hevqasi bêçare ne yan xemsar in?*

Tîşte ku mirov heri zêde xemgîn dike ev e. Miletikî ku bi qasî 20 salan şer kiriye, hejmara kuştîyên xwe nizane. Yen ku ji Tirkîyê çûne, tîrkan tu hesab û kitab ji bo wan negirtine. Rêkxistina ku ev mirov kişandine cem xwe û dane şerkirin jî hesabekî wiha negirtiye. Çiqas insan ji aliye dewletê ve hatine kuştin, çiqas reviyane, çiqas birîndar bûne û çiqas ji aliye rêkxistinê bixwe ve hatine kuştin ne diyar e. Li gora min niviskar û lêkolîvan nikarin di vê mijare de bigihîjin encamekê. Li bakurê Kurdistanê gelek malbat hene naxwazin were zanîn ku keçen wan tevlî PKK bûne, hinekan ji bir kirine û hêviya xwe ji wan birîne, hinekan li zarokên xwe pirsî ne lê negihane tu encaman. Birêvebirên PKK jî agahdariyê rasteqin nadîn. Ew nizanîn

ka ew mirovê lê tê pirsîn li kîjan deverê dimîne, sax e, miriye, li ber lehiyê çûye, fetisiye an tişteki din bî seri hatiye. Heger bibêjin jî rast nabêjin. Wan bixwe kuştibe jî dibêjin di filan seri de şehîd ketiye û piştî 5-10 salan dibêjin. Li gora min ev kîmanîyeke pir mezin e. Bi goti-neke din, encama vî şerî çekdarî ji aliye kurdan ve nayê zanîn û hejmarê rast li holê tune ne. Ez bawer nakim mirov bigihîje encamên rasteqin jî. Ez bixwe gelek caran li ser daxwazên malbatan li zarokên wan geriyame û min ji berpir-syarê heri bilind pirsine, lê ez negiha-me tu agahdariyan.

*Ci bandora PKK li ser guhertina rewşa jinê kurd çebûye?*

Di aliye siyasi de bandoreke baş çebû. Mirov gîhiştin zanebûna naskirina mafîn xwe û daxwaz kirina wan. Gelo ev guhertin encama tekoşina PKK bû yan encama bayê guhertineke gişî bû ku bandora xwe li ser jinê Kurd jî kir?. Ev hîna mijara gotübêjê ye. Fîrbûna siyasetê û lêpîrsina mafan xaleke girîng e lê bi ya min di wir de xeletiyen pir mezin jî hatine kirin. Di kesayeta kurdan de guhertineke mezin hatiye çekirin lê ew guhertin ne di berjewendîya kurdan de ye. Gelek nirxen bingehîn yê civakê hatin birîndarkirin û wendakirin. Ev yek li metropolên tîrkan, li Ewropa û gelek bajaren Kurdan jî tê dîtin. Gelek nirx li ber avê çûne.

*Pirtûka we ji aliye xwendevan ve cawa hat dîtin?*

Berpîrsyarê weşanxanê pir bi başî behs dîkin. Hejmareke mezin çûye û hatiye xwendin. Min heta niha çend pirtûkîn din jî nivîsandine, lê xuyaye ya ku heri zêde tê xwendin ev e. Li her derê ez rastî xwendevanê wê têm. Di rojnameya "Vatan" de behsa wê hat kirin û xwestin bikar binin. Wisa diyar e ku pirtûk nexwendine jî lê ji xwe re çend jêderk jê derxistine û bikar anîne. Tişte ez dibînim ewe ku bala xelkê dikşîne.


*Heppevîn: Hêvîdar Zana- Fadîl Ozçelik*

**Peyama Kurd:** *We di pêşgotina pirtûkê de gotiye ku hûn wan jinan weke yê "ne ji rîzê" dibînin, ango bi gotine-ke din ew ne weke her kesi ne, çima ew ne ji rîzê ne û ne weke her kesi ne?*

**Nejdet Buldan:** Dema ku mirov li rewşa Kurdistânê û Rojhilata navin dinere, mirov dibîne ku kultüreke pir xweser li wir heye. Rewşa jinan li wir tê zanîn he Hewcîye ku ez bibêjin. Li Kurdistânê "dema" ku hinek jin derdiketin diçün şer yan tevlî PKK dibûn, ez li wir bûm min didit li gelek navçeyan jî pira-niya jinan newerîbûn an jî nedixwestin ji malê derkevin, biçin sûkê jî xwe re tişteki bîkrîn, bîxebeitîp. Rewşa civakî bi sî vî awâhî bû. Disa dema ku jin derdike-tin dibûn şervan, gelek mîran şerî dijî kurdayetiye dikirin. Yanî tişteki wiha bû ku hinek mîran çek hildigirtin û diçün şerî PKK dikirin û jinân jî bi çekîn xwe, şer ji bo kurdan dikirin. Ev li gora min tişteki gelek balkêş bûn. Rastiyeye din ji heye, ew keçen ku derdiketin şerî çiyan dibe ku di mala xwe de nikarîbûn bi az-adî li gel bav, bira û tiyên xwe jî biaxivin. Îcar li gora min jinê Kurd bi hilgirtina çekan û derketina şerî çiyan tişteki balkêş û nû kirin. Rewşa wan pir balkêş bû. Kurtaya wê, jinê kurd yêkemîn jin bûn di civakîn rojhelata navin da bibûne şervanê mîleteki.


**Ji bo ci we bi taybeti ev mijar hilbijart, çima we got "ger mirov di PKK de jin be" û we negot "ger mirov di PKK de mîr be"?**

Min di pêşgotinê de jî behsa vê yekê kîriye. Heta niha jî mîr dikarin li her de-verê behsa xwe bikin. Di internetê de, di rojnameyan de dînîvisin û gelek jî wan pirtûkan jî derdixin. Lî belê ew jinê ku ji PKK cuda bûne, bi tenê di danûsten-dinê xwe yê şexsi de, di nava têkiliyên malbatî de û li gel kesen ku baweriya wan pê hebe diaxivin. Di wan gotûbêjan de jî bi tenêtiheke tişteki siyasi dibêjin. Ev tişteki balkêş bû. Rewşa jinan di nava PKK de û tenê bi çavê PKK û bi çavê dijminen PKK dihat nasîn. Îcar min xwest ew bixwe behsa rewşa xwe bikin. Çima tevlî PKK bûne, ci hatiye serê wan û ya heri balkêş jî hestêne wan ci ne? PKK her demê dibêje: "tekoşina me ji bo azadiya jinê ye". Di encama heppevîn min de derdikeve holê ku kesek ji bo azadiya cinsi, ya jinê neçûye, her kes ji bo azadiya welatê xwe derketiye şerî çiyan. Dijminen kurdan, ango tîrkan ji geleki li ser vê mijarê dilist, serokê PKK û PKK bixwe jî gelekî pê dilistin. Eger di



# Daxuyanî derbarey kampanyaya negatîv li dijî Ézîdiyan - (Beşêl)

**Amadekar:**  
**Hevkariya Komelên Ézîdiyan li Elmanya**



Piştî programa ZDFê û bi taybeti piştî ku Peyama Kurd wê programê wergerand kurdî û weşand, ev pirs di nav ci-vaka Ézidî de aciziyek peyda kir. Xuşk û birayêne me Ézidî ji weşana Peyama Kurd zêde êsiyan. Di hevdîtinên berpirsiyarên rojnameyê û Hevkariya Komelên Ézîdiyan de ev yek carek din zelal bû. Wan digot belkû Peyama Kurd jî van nérînan diparêze. Rojnameyê di pêşkêşkirina wê nivisê da ji xwendevanan re qenc ronî nekiribû ku ew nérînan wê programê ne û Peyama Kurd wan nérînan qebûl nake. Ev kemasî, şâsiyek mezin bû. Lî niyeta paqî dilsozan zu digihîne hevdu. Peyama Kurd li Oldenbûrgê bû mîvanê xuşk û birayêne xwe Ézidî û vê pirsê bi hevra axivîn û çareser kirin. Helwestê herdu aliyan Kurdevaran û Kurdistanperweran dilşa kir. Di hejmara buhorî de me ser vê mijarê nivisibû.

Em di vê hejmarê da ji dest bi weşana helwest û ragihandina Hevkariya Komeleyên Ézidî li Elmanyayê dîkin. Ev nivis dirêj e, emê wekî rîzenivîs di du hejmaran de biweşinîn, da ku xwendevan ji vê ragihanînê agahdar bibin.

Peyama Kurd

Helwest û ragihandin di derbarey raporten di ZDF-Frontal21 û rojnameya hefteyî ya kurdî Peyama Kurd de

Di kovara siyasi Frontal21 a ZDF de, roja 12.02.2005ê li jîr serîvisa „Ji bo zewacê têne mecburkirin - Adetên Ézîdiyan ên oli li Elmanyayê“ raportek hate weşandin. Ev raporta televizyonê hate wergerandin bo zimanê kurdî û di 18.02.2005ê de di rojnameya hefteyî ya kurdî Peyama Kurd (Bonn) de ligel hin gotinên destpêkê yên kurt hate weşandin.

ZDF û Peyama Kurd behsa çiroka jineke Ézidî ya ciwan ji Celle dîkin, ku bi mîrekî musilman re zewici ye.

Peyv û şeweyê raportê: Çirokên hin keşan û guhertina rastiyan ji bo xerabkirina bi armanca wêneyên Ézîdiyan û bi taybeti ya ola Ézidî têne bikaranîn. Ézidî mîna grûpeke zordarîxwaz, nûnerên civateke kevneşop û herweha kesen xwedî ramani-ne kevneşop têne pêşkêşkirin.

Ti agahiyan rastî di vê raportê de peyda nabin û piraniya wan nerastiyê ser ola Ézidî ne, ku li Elmanyayê kêm naskirî ye. Ji ber vê yekê, emê li vêderê hinekî bi berfirehî li ser ola Ézidî rawestin û derbarê xalêne di raportê de nerîna xwe bêjin:

Ola êzidî û ramana wê ya li ser Xwedê:

Di raportê de tê şirovekirin: „Ew [Ézidî] baweriya xwe bi Xwedê naynin, lê bi melaiketan. Ola wan bêtiri 1000 sali ye [...]“. Ev peyva çewt Ézîdiyan dike kafirîn bê Xweda. Lî ola Ézidî oleke ku baweriya xwe tenê bi Xwedayekî tîne, ku dîroka wê 2000 salan beri İssa ye û digîhe heta dema Mi-thraizmê.

Li gorî baweriya Ézidî, li kîleka Xwedê ti hêzeke din nikare peyda bibe, ku bêyî erêkirina wî bikare tiştê xerab bike. Ji ber vê yekê gewdê xerabiyê tune ye. Ev yek dihêle ku mirov bibêje ku gotinên di rapporte de bi temamî berevajî ola Ézidî ne. Weha dixuye ku xwestine ola Ézidî mîna şâsiyên sektekê bête nişandan. Ev yek ola Ézidî ya bi hezaran salan kevn xerab dike û derbekê di hundîre dilê civaka Ézidî dixîne. Ev derbe hîn girantir dibe, ger mirov wê rewse bîne ber çavan, ku bi taybeti di cîhana islamî de hêz û kesen ku mohra „kafirî“ lê didin bê çawa têne çewisandin û binpêkirin, ku Ézidî hertim para xwe ji van hêrişan digrin.

Li welatê xwe herêmên ku tê de dijin, di Rojhilata Pêşiyê de, Ézidî berê û niha jî rasti cote çewisandinê dihatin û hêj tê: Li aliyeke di warê etnikî de, ji ber ew Kurd in, û li aliye dî de di warê oli de, ji ber ew di çavên Musilmanen fundamental de weki „kafir“, kesen „ji rîya Xweda ya rast derketi“ têne ditin, an divê ew li rîya rast vegerin an ji qetla wan tête helalkirin. Bi ditinên Musilmanen radikal, ji yekî ku kafirekî bikuje re, deriyê buhuşte vedibe.

Musilmanen fanatik, ên ku gundêñ êzîdiyan talan dîkin, an bera nişteciyan didin, mirovan dîkujin an jînê wan direvînîn, dezgehêñ dewletê işe xwe ji wan qet nayne. Destê xwe ji wan naynin ji ber an ev pirs li konsepta wan siyasi tê, yan ji ji ber nûnerên dewletê bi xwe ji musilman in, eger tevlî kirýaran nebin ji lê bîr û baweriyêne kesen radikal par dîkin.

Di herêmên xwe de, Ézidî tenê dikarin têkevin civakê, ger ew Ézîdiatiya xwe veşerîn, li nasnameya xwe neyên mûkîrê. Paraztina ji aliye dewletê ve ya kêm bû sedem ku bi taybeti di salen heyşeyî yê sedsala bistê de Ézidî, ji Tirkîyê, bi hezaran koçberî Elmanyayê bikin.

**Li cem Ézîdiyan zewac û mafêñ jinan**

Raport berdewam dike û dibêje: „Jin bê-maf in. Hin di ciwaniya xwe de, keç ji bo zewaca bi xwarzê yan pismamên xwe re têne girêdan.“


Ev hevok berqulopandineke bêaxlaqî ya rastiyan e. Di ola Ézidî de, élémenten ku binpêkirina mafêñ jinan dipejirîn, tune ne. Jin herweha di jiyana rojane de ji nayê bipashistin. Li nik nîfşê mezin têgîhiştina erf û adetên berê serdest e. Di vê derbarê de, ti cudahî di navbera nîfşê ciwan û derûdora wî ya civakî de tune ye.

Di olê de ti naverokên wisa tune ku tesbit û diyarkirina zewacê bide destê dê û bavan. Di zeremoniya zewacê de, divê ji bo erêkirina bûk û zaveyî bi kîmasî sê caran bête pirsin. Pirsa zewaca bi zorê ne problemeke Ézîdiyan a taybeti ye, lê belê ev problemeke herêmê ye ku Ézidî ji wan deran tê. Li wan deran zewaca di nav malbatê de heye û ev erf û adeteke keynare ye; wekî demen berê, heta iroj di hedeki de di nav hin tebeqeyen gel yên ewropî de pêk dihat û iro ji pêk tê. Ézîdiyan xwe ji vê tradasyonê bi piranî rizgar kiriye. Mecburkirina zarokan li dijî prinsipen me ne, ku em gellek hurmeta wan prensipan digirin, ji ber ku em bi xwe gelek hatine peliqiqandin. Herweha tê ditin ku bi taybeti ev mecburkirin dikare bibe sedem ku mirov xwe dûri ola Ézidî bixe.

Di ola Ézidî de selahiyeteke herişker tune ye ku bi agir û şûr yê ji rîderketi bête vegeerin, ku di olên din de tê zanîn ev tişt heye. Adeta zewacê ne adeteke ya xwe ji yên din çetir ditinê ye, lê belê mîkanîzimeke xwe paraztinê ye ku di dîrokê de pêk hatiye, ku di demen çewisandinê de hevgirtin û piştigiriya hevûdu, navxweyi xurt dike. Ji ber vê yekê ev adet di civakê de bi şeweyekî xurt cî girtiye. Lî ew qet ne xaleyekî oli ya bingehin e.

Derbarey vê yekê, divê mirov ji bir neke û divê bê gotin, ku di qaxezekê desturê ya Vatikan de, ku ji aliye Papa Johannes Paul II ve hatiye pejirandin, mirovên katolik hisyâr dîkin ku bi Musilmanan re nezewicin (Rheinische Post vom 15.05.2004) -

**Werter: Sirwan Hecî Berko  
(Berdewama wê hejmara pêşiyê)**



**Hevkariya komelên ézîdiyan û Peyama Kurd pîroz dîkim**

**Mamoste Kemal Tolan**

**E**z weke Kurdeki Ézidî û endamê Mala Ézîdiyan ya li Oldenburg ê gelêkî dîlxwes bûm, ku nîrîn û rexnîn me xwandevaran û xizmeta hinek malperên çapemeniya Kurdi dîkin, rîya li ber hevkariya hinek perpirsyarên komelên Ézîdiyan û rojnameya Peyama Kurd xweskirin. Bi ditina min ev tê wê mahneyê, demek dema em Kurd berjewendiyen Kurd û Kurdistanê têxine pêsiya ya sexes xwe, em dikarin vêga ji serbîvin û incar gelek kîmasî û sermezaryen di nava xwe de bi hevûdinê re, bi sikleki zanisti, aşîti û birîzyetiye çareser bikin.

Hêvidarim, edî ev hevkari û hemû tîfaqen ji bona berjewendiyen Kurd û Kurdistanê bes rî bidîne şâxitîyên dîrokî û ew di armancen xwe de her serkevti bin.

**Bî silavên biratiye**

**Ezdîti bawarya heqyê, re'mê û Xwedênasnyê ye - 2-**

**Eskerê Boyîk**

Lî cem Ézîdiyan tu ol ji ya din heqtir yan neheqtir nine. U'lmê vê olê da derheqa tu bawaryê da xirav nayê gotin, himberî xwe tu oli biçûk yan mezin navîne. Ézdi bi destê zorê tu kesi mecbûr nakin bê ser ola wan.

Vê bawaryê da pîrsen tîfaq, yekîti û tevayê çawa serê safikirina hemû pîrsigire ka tê ditin. Tîfaq ne ku tenê nava Ézîdiya da li usan ji tîfaq di malê da, civakê da, li nava hukumdar, mîlet û dewletê da, heta cihanê da himê xweşyê, başyê, heqyê û Xwedênasnyê ne:

*Cûma dîwana wî padşayî,  
Min lê ditin xwesi û şayı,  
Serê hemyan tîfaq û tevayî...*

Di êzîdityê da di navbera e'vd û Xwedê da e'vdek, rîberêk yan ruhberekî din nayê qebûlkirin. siqas ji xas û qelen-deren ézîdiyan hene, lê disa anegorî edeba vê bawaryê ew dewyê da, roja qiyametê li ber Mirê xwe cawa emelê xwe didin.

Bawariya wa çiqası ji di vî dîni da qedime, disa ézdi qedir dîdinê pêxemberan, xasan û qewil, beyt, due'a-dirozgân xwe da bi hurmet û qedir navê wana bir tinin: (Adem, Nuh, Birahîm Xelîf, Zerdeş, Mûsa, İsa, Mehmed). Bi texmîna me ev fikira ji tînê wê rastyê, ku ézîdîji wan yekem dinê keynare, ku ji berî pêşdahatina Pêxembera hebûye û bawarıji yekîta Xwedê, Ezda anye. U'lm da wa tê gotin: „Ferwar hatiye ji ba melekê celîl, hemû dema û hemû bedil, berî Mûsa û İsa û Birahîm Xelîf“.

Bi texmîna min wezifa pêxemberan ku olên din da beser dîkin, ezdayê da wê rolê Tawisi Melek dilize. Eva ji nişan dide ku ola ezdayê ji berî olên bi pêxember hebûye, dîmek ezmâni ye, ji qewata besera bilindire... Bi kirymet û heqya ezmanî Xwedê tek kare bê teref, bê cudayatya oli cihanê, jîyanê, temamya e'vdan, beseran, ruhberan binhêre, xêr û şera ji hev başkeke, ji alyê tu kesi da li ser kesi zordaryê, neheqyê qebûl neke. Eger ézîdî çawa bawarıji pey olên bi pêxember û bi kitêbên pîroz ra pêrsa hatibya usane ewê ji li ser navê pêxemberekî bûya û kitêba wêye pîroz ji wê bîhata nivîsar. Sedsala 11 an, dema mixadî da, qona-keke nû di nava ezîdityê da dest pê kir. Hatina mixadî li nav ézîdiyan bûyareke mezin bû ne tenê di jiyana civakên vê bawaryê da, lê di qewimandinê Rôjhilatê yên wê demê da. Be'sa hatina mixadî zû bela dibe. Ji her dera oldarên mezin, sofi, bawarmend, merivêne bi nav û deng xwe wê dîrîigrin, tê, ku kirymetên mixadî bi cevî xwe bîvinin. Rast goti fikira hatîna gelek ji wan, çawa edeba dînê ézîdiya da ji dihar dibe ne ya qencyê bûye. Pirs pêjda tê cîma guhdarya der-doran ewqas pir li ser wê hatinê bûye?

Jinekolog, mërekolog, dînekolog Prof. Doc. Dr.

**Fatê Were Civatê****Şêxbat**

jî gotibû "Pêxember jî Tirk e, hemi insan Tirk in". Îcar Fatê Xanim, ka falekê veke bê ev ci meseleye da ku ez "doktora" xwe li ser bikim ez xulam!"

Abdilcebar Vitvitoglu / Konya

Lao agir bi malê keto ma "Vitvitoglu" jî paşnave ker kurê kerê?! Ma navkî din tunebû laoo! Ji navê te xuyaye yan tu qûndeyî yan jî tu ji malbata teyrik û çûkanî... Lao bêwîjdan, ci eleqa serê min û Ecevit û Kemalê Selanîki pev heye malneket! Abdilcebarê Vitvitoglu, ezê niha stranekê vitvitki ji te re bêjim go ev stran di sere te de bimeyê û tu rabî û rûnê bêji "vit û hey vit". Îcar biner vitvitkê mino, heçê Tirkîn van tiştan nabêjin. Çima nabêjin? Ji ber go zanin bê ew ci qumaşın. Zanin go xwedê jî ji "hacûc û macûcan" hez nake û Pêxember jî. Ji ber vê newêrin dengê xwe bikin. Lê evê go dibêjin "Tirk nijadê serdestin û Pêxember jî Tirk e" ew kesen mîna "qantire" ne, diya wan mehin û bavê wan ker-e. Yanî bi zimanê gundikî "bê eslin û xwîna wan ne zelale. Yanî melez in. Ji ber vê hertim jixwe bi sık û goman in. Berî go xelk êrişî wan bikin, ew êrişî xelkê dikin. Îcar serê xweyê vitvitî neşin ezeni. Ha Evdo got "serokatiya konfederalizmê" û ha yekî melez got "Tirk nijadê serdestin û Pêxember Tirk e, ci ferg heye canê min! A baş tu quran û hedisan bixwine, tê bibini bê ki nijadê serdeste û Pêxember jî Tîrkan re ci gotiye.....

\*\*\* \*\*\*


**Fatê Xanim, ez xortekim, çavbelekim, nuh gihame weke deq im. Min nîta xwe xirakiriye go bibim nivîskar, helbestvan û romanîci. Min bihistiye go heçê nivîsekê, helbestekê, çirokekê dinivise, li ber navê xwe "Doktor" an "Profesor" datîne û payebilind dibe. È bi serê te yi tiştî nefsa min ji piçûk kir û min ji got "de ka ez jî çirokekê binivisim û ji xwe re bibim doktor û profesor". Çima ma ez ji wan këmtir im?! Ma tu ji ji xwe re nabêji "Profesor. Doçent. Doktor, jinekolog, mërekolog, dînekolog?" Ji xwe è te te mala xwe birye miratê û evqas "kolog û molog" lidû hev rîzkirine ma ev bû ci gidişî! È bi xwedê ez jî dixwazim bibim Doktor û Profesor hîti! De ka stuyê xwe bîşkin û şiretekê li min bike!**

Remoyê Çavnebar / Alamanya

Yahewlelwela li min û li vî ehmeqî laooo! Kuro Remokê çavnebar, zikreşo, hesûdo lao ma tu li ku û nivîskarî li ku! Tu li ku û Profesorî-Doktorî li ku! Lao ma kalkê te Profesor bû, bavê te Doktor bû, diya te jinekolog bû go tu dixwazî bibî jehr û ziqûm hêê! Yanî niha tu dibê qey Profesorî-Doktorî hevqasî rehete neeee? Teww, teww, teww li min û li vî Remokê Çavnebar! Kuro lao, ma kurê ciwamêran hindik "tir û fis" kirine heta go bûne nivîskar, Doktor û moktor ehmeqo! Na heger tu illeh dixwazî nayekî li xwe bikî, wî çaxî stuyê xwe bîşkinê û li Fata dînekolog guhdarî bike: 1. Diyê berî hertiştî tu dizekî temam bî. Divê tu çend helbest û nivîsên xelkê bidizî û navê xwe libin binivisi. 2. Divê tu bi kêmânî li dibistanekê dersê bîdi du sagirtan û wan fêrî "a, b, c" bikî. 3. Divê tu zimandirêjeki baş bî.

**Xaçerêz****SEREJÊR**

1. Kulturî, adeti / silkirin, leresandin 2. Navê wela-teki 3. Du tip / lebatek (organek) mirov / pêşir, navbera zîk û gewriyê 4. Jê nan çedîbe (pasûpe) / padışahîkî / imparatoriya Med / zinetek girabuha 5. Agir pêket, rivin da / gotina telefonê (pasûpe) / notayek 6. Bi xwe re hil-girtin / adet, tote 7. Du tip / roi / kliçik, sa 8. Navê nijadeki / xortê çeleng, li-hevhâti (pasûpe) 9. Li bakur navê gundeki / naveki Japonî 10. Destnisanîyek (pasûpe) / heywanek kevare ku tuxmî wê qelyaye

**ÇEPERAST**

- Kultur, adet / bi arab ve giredayî 2. Çekir xulugand / vexwarinek 3. Du tip / qewmê Kurd / Îcar, vêga (pasûpe) 4. Edalet, heqî / welsî, hoy (pasûpe) 5. Buhastî, cinnetî (pasûpe) / navê rojekê 6. Pêxembererek / agir, namûs / du tip 7. Pilotê ezmanti, ezmannas 8. Du tip / ala piçûk, nisan / sergiranî, kubari 9. Pe genim fi ceh te qinîn / navê çîcek û külilikê bêhixwes 10. Heram, bêdebelî (pasûpe) / tur, ger, dos 11. Ne mî, mîr / hejmarek 12. Kesen ji Colemergê (pasûpe)

**Bersivêñ hejmara berê****Ceperast**

1. Avis / ikram 2. Gerden / ora 3. Ira / mester 4. Mabûz / mazî / kavî / hancut / ska 7. Sar / bas 8. Rî / sinegog 9. Ango / uska 10. İk / kîz 11. Las / Janî 12. In / kîfxwes

**Serejêr**

1. Agir / isralî 2. Vera / insan 3. Iraknasa 4. Sd / inçisîler / emî / qurî, kîz / inebî / no / nf 7. Nan / bestax 8. Rota / sagab 9. Arzûsok / ac 10. Marîna / names

**Röviddarık****Beran (21.03-20.04)**

Bi geşî û henekên xwe, hûnê karîbin bandorê li derûdora xwe bikin û xwe têxîn çavê wan. Dudilî û aloziya di sere xwe de bavêjin û bi sernermî û bi bîriyar berdewamiya karê xwe bikin.

**Gamês (21.04-20.05)**

Daxwazén we zêdetir dibin û hûn lezûbez didin karê xwe. Lê kün karîn têkevin nav bêaramî û bêhîntengiyê. Zor û zehmetiyê nedin xwe û derûdora xwe, ji xwe haydar bin.

**Cêwî (21.05-21.06)**

Wê hinik bûyer we têxîn heyecanê. Fersendên derkevin pêsiya we nerevînin û heta ji we bêwan bidestxin. Serhişî û ezeziyê nekin, serê xwe bi tiştîn nehêja neşînin.

**Kevjal (22.06-22.07)**

Wê pêşewazî û pêşniyazên balkêjî we re bê û hûnê di nava heyecanê de bin. Dibe ku vexwendnameyek têkeve destê we û hûn vê evarê bicin vexwendivekê.

**Mêzîn (23.09-22.10)**

Xwestek û daxwazén we berz û xurt in. Hûnê ji bo pêşeroja xwe fikrîn baş bikin û têkevin nav lêgerinekê nuh. Zêde xeyalperest nebin û karê zêdeyi hêza xwe nekin. Berpirsiyariyên giran negrin ser milen xwe

**Dûpişk (23.10-21.11)**

Ji bo we rojek bi heyecan û germ e. Lê hûnê heyecana xwe têxîn bin kontrola xwe. Hûn Karîn carek din têkiliyê xwe û hezkiriyê/ya xwe di ber çav re derbas bikin. Lê zû bîryarê nedin.

**Kevan (22.11-21.12)**

His û gîyanê we nerm dibin. Hûnê giranîyê bidin ser karê xwe. Wê rûdana hinik bûyeran moral û kîfa we bîne cih. Hûn Karîn piştgiriyê ji dost û hevalen xwe bigrin û têkiliyê xwe kurtir bikin.


**Kovî (22.12-19.01)**

Hûnê rojekê xweş û bi kîf biborînin û hewl bidin ku ji bo pêşketina karê xwe şêwîyen xebatek nuh biceribînin. Hûn di demekê zîz de ne, pêşewazî û pêşniyazînuh karîn derkevin pêsiya we. Hûn





## Cerbandinek



Bedirxan Epözdemir

Ku birastî bêjim, gelek caran ji dilê min nayê ku ez binivsinim. Pir caran dice-ribinim, hewildidim, liberxweditim, xwe hinek hêsadikim, lê dikim û nakim bêje nayêne cem hey, hevok lipey hev rêz nabin. Demên borî têne ber çevênen min. Rewşa ku em têda dijin û duwaroja me. Mijar hev diqewrînîn, pirs û pirsegirik lihev têne lefandin. Dibine wek gi-lokek benik. Têkli hev dibin gelek caran, dibine girîyeke kor, napişkîvin, venabin ji hev. Ü pirs, pirs, pirs.. rêz dibin li pey hev. Giloka benik, carna ji xwe şerit û werisan diefrine. Dibî bêser û bêbin. Ne taqeta min heye kû, ez bigêhjime wan, ne ew li hêviya min dimînin.

Vêca ku demsal payîz yan ji zivistan bî, dar û ber sitûxwar û meltîl bin, yek dengî û yek rengî xîtma xwe li xwezayîyê dabî û dem bibî xwezgîniya nûçeyen reş. Dilê te zîz, çavêne te li derî û penceran bin, guhêne te bel û bendewarê nûçevanan bin. Wê, ezê ci û cawa binivsinim? Wê bi kijan hêz ezê bikaribim, derd û kulan bireşinime ser kaxizan?

Ez we nizanim, lê kîyfa min qet nayê ji hinek demsalan ra. Kesêni romantik

bixeydin ji ev rastîya mine û bi salane ku nayê guhartin. Ev demsal, li cem min bûne remza xeberêne reş, bûne tirs, bûne xof. Sedem ev e, di van demanda lerza min, tirs û xofa min. Wusa bûye ku di van demsalanda, ez bi şik û guman idî temâsa şahî û bûyerêne xweş dikim.

Delalên min hebûn, evînên min hebûn, xeyalên min hebûn. Ku min bi wan ra heyî û tuneyîyê, xweşî û nexweşîyê pardikir. Ku me di şuna pêxwarinê da hêvi ji xwe ra dikir, qatix. Ü bi helbest û kilamên serketinê me sebr û sebata xwe tanî. Bi bêbextî ji min sitand wana, ew demên keysperest. Min ji delalan mehrum, ji evînan bêpar kirin, xeyalê min bi avê ve cûn. Ez bê qatix, bê helbest û bê kilam mam.

Sebr û sebateke min ya rasteqinî ji, nivîs bû. Lê digerim, vêga, nabînim. Ü temên kevin têna bîra min. Xwe bi wan mijûl dikim. Xwe dixapînim, bi mijokên sexte, wek zarokên ku di himbêza dayikên xwe da têne xapandin. Piçêk hêsa dibim. Pişti gotinê destê min yê eziz - Ku çend sal berê ji nav me barkir û cû, ku ez dikim-nakim lê jîbir nakim. di guhêne min da dikin cingin. "Binivsîne, wê rojek bê ciye xwe bibine. Pêwiste nivîs ji bin bandora hêjar û rebeniyê azad bibe û bigêhjêne menzila xwe ya rasteqin." De fermo, were nenivsine. Bêmecalmim, dikim qêrin û gazi; Heyhat, hawar! Min hevaleki xwe yê rasteqin hindakir. Yanî ez li nivîse digerim. Gelo, hûn rastî hatin?

Berê nivîs hebû. Sebir û sebat bû, gelek

## Nivîsa rebenê

caran ji meriv ra. Xudan siyanet û paye bilind bû. Heval û hogir bû, di demen teng da. Bi taybetî, li xeyran û xurbetê tenêtiyê pardikir û diqewrand. Xwedan hêz û heybeteke bilind bû. Hêza pênuş û nivîse gelek zexim bû. Hindik bû, lê rindik bû. Pir caran, tarîtiyan diçirand. Dibû hêvi û ronahî, Perwerde bû nivîs, ji bo nezanen. Rê nişanî civatê dida, civatê bi zanistîyê dixemland. Delalî tû başiyê direşand, li dor û berê xwe. Tirs û xofeke gelek mezin bû, ji bo gelek kesan. Gelek kes diricifyan. Digotin; Eman, eman bela nivîs nekeve derê me. Ü hinek kesan ji, piçûk diditan nivîs û nivîsandin. Henek û laqirdîyan xwe dikirin pê. Diviyan ku nivîs, jar bikeve, xizan bî, bêtaqet û bêmecal bimînê. Lê, biser neketin. Delalî tû başiya nivîs û pênuşê, wan perwerde kir, kişande nav refen xwe. Mecbûr bûn. Bejna xwe tewandin, ji hêza paye bilind ra. Lê di dawîyê da, nivîs lewitandin. Nivîs xistine alet ji bo armancêne xwe yên qirê.

Li aliyeke din ve nivîs; cirim bû, tawan bû. Yanî sicin bû, zîndan bû. Sedema vê ji, ji bo hinekan ji, tirs bû, xof bû û xopan bû. Ü direvîyan bi şev û rojan ji nivîse...

Berê nivîs hebû. Hevqas hêjar û reben nebû. Bi hêz bû, bi rêz bû. Ronahî û şehreza bû.

Di destê keysperastan da haceteke qirê nebû. Taybetmendiyen nivîsê hebûn. Xwedan terbiye û perwerdeyeke paye bilind bû. Li dor û aliye xwe van taybetiyan direşand. Herkes hedê xwe dizanî li himberî nivîse.

Lê heyhat...! sro, nivîs jar ket. Di destê keysperastan da bû haceta qirêjîyê. Dubendî, dek û dolap bi nivîse têne vesartin. Nivîs edî perwerde û delalîyan naefrine. Kes fenakire li pora xwe ya sipî û temenê xwe. Herkes bûye qelemşor. Bêperwa dileyzîne pênuşâ xwe. Ü hestiyê ziman tune. Bavêje bavê min, bavêje. Ne xesasiyeten netewî, ne ji merheza duwerojê. Kin û edawet reşandin, belki ji bûye karê rîhsipî û kalemerêne me. Bi forte û pesin dîrokê ji xwe destpê dike. Bi "hevalno" celsê vedike, pişti bêkes û kûs civînan terk dike.

Ü êşa herî giran... Nivîseke, bêcerbandin, bêarşîv, baqîj û delal, lê sed mixabin nezan. Pişti "abê"ci ti. Yanî, miridi. Ü pêra ji, narkokî, teklihevî û dubendî. Li alîyê din ji, di nav xizanîyê de rexne. Dinale û dikale. Yanî, yan pesin, yan ji reşkirin. Ü dibê; ev çibû hate serê min? Hey...! Nivîse rebenê. Tu bûyi haceta van hemûyan.

Berê nivîs hebû. Kubar bû, payebilind bû. Berê nivîs hebû. Delalî, evîni û xwesbînîyê direşand, li dor û alîyan.

İro ji nivîs heye. Lê hisnîye, şermazare. İro ji nivîs heye. Lê di mejîyanda "qereqol"an avadike, bûye haceta nexweşîyan, di desten nezanen da.

Hey...! Nivîse rebenê, tu yê kengê ji desten xêrnexwezan bifilti û azad bibi? Tu yê kengî disa bigêhjî menzila xwe ya berê?


## Ghobadi û Akin li Meksîka xelat wergirtin

## PK/MEKSİKO

Di festiwala hevdem a navnetewî ya Meksika de derhênerê Kurd Bahman Ghobadi û derhênerê filîmê „li himber dîwê“ Fatih Akin xelat wergirtin.

Di festiwala ku di navbera 16-27 ê Sibatê de li Meksikayê çebû, ji 40 welatan nêziki 128 filîmên dirêj û 25 ên kurt pêşewazî bûn.

Derhênerê Kurd Bahman Ghobadi bi filîmê xwe „Kûsî Jî Dikarin Bifirin“ xelata filîmê herî baş wergirt. Derhênerê filîmê „li himber dîwê“ Fatih Akin ji xelata derhêneriya herî baş wergirt.



## Tirk ji giyayê Kurdistanê jî ditirsin

Tirk navêni giya û nebatêne Kurdistanê ji diguherînin. Bi taybetî ev helwesta nemirovi pişti salen 501 bi xurtî ajot. Tirk ne tenê navêni Kurdî, herweha yêne Ermenîkî, Lazî û Pontûsî ji diguherin.

Cend nimûneyen ji wan ev in:

'Centaurea Kurdica', 'Pterocephalus'

Kurdicus', 'Verbascum Kurdicum', 'Pacacaryum Kurdistanicum', 'Phlomis Armeniacâ', 'Symphytum Armeniacum', 'Silene Lazica', 'Carex Pontica'

## İddiayê li ser Jackson can dilerizîne



Di daweya Michael Jackson de ku bi tacizkirina zarokên biçûk tê tawanbar kirin, iddiayê dûrî aqilan hat rojevê. Li California di mahkemeya Santa Maria de birayê zarokekî ku tê iddia kirin rastî tacizê bûye hat guhdarkirin. Star Arvizo yê 14 salî di ifadeya xwe de got ku wî li çiftlikâ Neverlandê de bi çavêne xwe dîtiye ku stranbêjê navdar dest avetiye birayê wî yê 13 salî. Arvizo dibêje ku Jackson alkole bi zarokan dide vexwarin, filîmên porno nişanî wan dide û wan tazi digerîne. Arvizo iddia kir ku wexta birayê wî yê 13 salî raketibû Jackson di nav nivînan de ew firkandi ye.

Arvizo got: „Min dît ku destê cepê yê

Michail di nav derpiyê birayê min debû û destê wî yê rastê ji di nav derpiyê wî de bû. Masturbasyon dikir. Çavêne wî girti bûn. Min nizanibû ci bikim û vegeriyam odaya mîvanan.“ Arvizo ragihand ku ji bo ji tu kesar re bahs neke hatiye iqaz kirin.

Di mahkeme de Michail Jackson tewanbariyen Star qebûl nekir. Ger Jackson súcdar bê ditin dikare heta 21 salan ceza bixwe.

Çiftlikâ Michail Jackson ya li Neverlandê ji Elizabeth Taylor heta Marlon Brando gelek kesen navdar ziyaret kribûn.

**KURD-KOM / Diyarbekir**

Piştî xebateke dirêj, civînên plankirî û danûstandinê dualî/sêali û.w.d. KURD-KOM, bi 28 hîmdaran û bi alîkariya bi sedan piştgiran hat ava kîrin. Rêbaznameya KURD-KOM-ê, bi zimanê Kurdi û Tirkî hat amadekirin. Serîlêdana fermî, di vê çarçeweyê de pêk hat. Lêbelê dezgeha fermî, rêznameya Kurdi negirt û red kir: KURD-KOM, bû fermî. Em ê di rojêne pêş de bi réya noterê serîlêdana rameya bi Kurdi jî pêk bînin.

KURD-KOM, bi nasnameya Kurd ava dibe. Qedexeya li ser nasnameya Kurd û Kurdistanê, helwesteke njadparest e. Ji bona vê yekê, KURD-KOM pişgiriya parastina mafênen herkesi ve her dezgehekê dike ku xwe bi nasnameya Kurd û Kurdistanê organize bike.

KURD-KOM, komeleyeke sivil û demokrat e. Li pişt KURD-KOM-ê dîrokeke dewlemed û sivil ya 100 salî heye; ji vê ceribandinê dersderxistîye û gihişîtiye encaman. Ji vir û wê de jî, ji bona ku çanda sivil û demokrat pêşbikeve û kûr-

bibe; pirreng û plûral bibe, dê hewil bide.

KURD-KOM, ji hemû Kurdan re û ji hemû kategorîyen civakî yên Kurd/Kurdistanê re, vekiriye. Li hemberî hemû nerînên siyasi û rîexistîni, li hemberî hemû idêoloji û felsefeyan, û li hemberî hemû ol û mezheban bê teref e û ji wan istifadekar e: Bi taybetî jî naskirin/danasina hemû fikran/felsefeyan û ol/mezheban ji bona KURD-KOMê pirsgirêkeke gellek girring û hêja ye.

KURD-KOM, li ser bingeha mafênen Miletê Kurd yên grubi/kolektif û şexsi/kesayeti ava bûye. Ji bona ku Miletê Kurd mafênen xwe yên grubî û şexsi qezanc bike û Miletê Kurd bigihîje mafêne xwe yên idarekirina xwe bi xwe, di qada sivil û demokratik de xebat dike.

KURD-KOM, di xebat û têkoşîna xwe de, hukuka navnetewi ya demokrat û insanî dipejirine; peymanen navnetewi yên di derheqê mafênen mîletan û mafênen mirovi de ji bona xwe wek rîber dibîne. KURD-KOM, di xebatê xwe yên rê-

# Kurd-Kom saz bû

Piştî xebateke dirêj, civînên plankirî û danûstandinê dualî/sêali û.w.d. KURD-KOM, bi 28 hîmdaran û bi alîkariya bi sedan piştgiran hat ava kîrin

xistinî û hûndirî de, bi endam û Civatea Kurd re pêwendiyê xwe di çarçewa demokrasiya plûral û rasterast de wek sistemeke idarı, wek nérîneke giring qebul dike; ji bona ku ev sistema pêk bê pîvanan tespit dike; dezgeh û pêvajoyan bi dar dixe.

KURD-KOM, rîexistîneke serbixe ye, û dê di paşêrojê de bi rîexistînen ku bi nasnameya Kurd avabûyi û hevarmanc re dê li Diyarbekirê Federasyonê ava bike.

KURD-KOM, dê bi rîexistînen sivil demokratik yên li Diyarbekirê û şerevaniyan re pêwendiyê xwe dê xurt bike û dê bi wan re hewl bide pékanîna projeyen hevbes.

**KURD-KOM:**

1- *Ji bona ku Zimanê Kurdi li Komara Tirkîyeyê bibe fermî; ji bona ku rewşenbir, siyasetmedar, malbat, zarok, dêtbav, dezgehêne Kurd, fêri Kurdi bibin projeyan û qempanyayan li dar dixe. Ji bona ku edebiyat, çand, huner û dîroka Kurd pêş bikeve, Grubê Xebatê ava dike; bi riya wan, projeyan li dar dixe. Ji bona ku TV û radyoyen Kurdi/Kurd ava bibin hewl dide. Bi TV-yêne herêmî re di gellek babetên cihê de programên hevbes amade dike.*

2- *Ji bo Koçber û Rûniştavanenê Kurd yên li metrêpolê û ji bona pirsgirêken wan; ji bo dejenarasyona civakî; ji bo semîner, konferans û panêlan; ji bo weşanan, arşiv û pirtükxaneyê Grubê Xebatê ava dike.*

3- *Bi Kurdên Başûr, Başûrê-Rojhilat*

û Rojavayê Kurdistanê re pêwendiyâ çandî û perwerdeyî li dar dixe, ji bona xwendina xwendevanenê Kurd bi zanîngehêne Başûrê Kurdistanê re pêwendî çê dike û ciwanenê Başûrê Kurdistanê re pêwendî li dar dixe, Grubê Xebatê ava dike.

4- *Bi jinan û Ciwanan re pêwendiyé xurt dike, ji bo wan projeyan dixe jîyanê û Grubê Xebatê ji bo van kategoriyan civakî yên Kurd ji ava dike.*

5- *Ji bo mezinê Miletê Kurd yên li Bakurê Kurdistanê xebateke biyografik dest pê dike.*

6- *Gruba Xebatê ya şopandina Yekitiya Ewrupayê ava dike.*

7- *Ji bona şopandina ixlalkirina Mafênen mirovi, ji Hukukzanan Gruba Xebatê çê dike.*

**Koma Birêvebir a KURD-KOM-ê**

- 1- İbrahim Güçlü Berdevik
- 2- Darulkeyyas Akay Berdevik
- 3- Seyhmust Aykol Berdevik
- 4- Ahmet Sedat Ogur Sekreter
- 5- Fahrettin Olgaç Berpirsiyare Malî
- 6- Abdulcebar Bîlîr Endam
- 7- Turgut Ersoy Endam
- 8- Baver Uçaman Endam
- 9- Fethî Aslan Endam
- 10- Rojhat Okuducî Tuşî Endam
- 11- Elizabet İldeniz Uçaman Endam

Amed, 05. 03. 2005 (Saet: 14:00,  
ADRES: Ekinciler Cad. GAP Apt.  
B Blok, No: 3, Yenişehir (Vilayet)/  
DŞYARBAKİR)

**Li ku û kengî Newroz? Li ku û kengî Newroz? Li ku û kengî Newroz?**

## Bijî Newroz Bijî Kurdistan

**19.03.2005**

Seet: 17:00  
Bîmet: 12 Euro

- Fatê
- Brîndar
- Şilan
- Evîn
- Ronîcan
- Lokman Cemî
- Koma Nemrût (bi dahol û zirne)

**Werder Str. 53a, 44628 Herne**

Hevkari - Platforma Rêxistinê Kurdistanê li Almanyayê


19-03-2005 seet: 17:00  
Navnîşan: Anadoloveranstaltungsaal Billstr. 199  
20539 Hamburg  
Amadekar: Platforma Kurdêni Hamburgê

19.03.2005  
Albertslund Kulturhuset  
Bibliotekstorvet 2  
2620 Albertslund  
Amadekar: HEVKARI

20.03.2005 14:00 - 20:00  
Navnîşan: Kulturhaus Arena  
Ulmerstr. 241  
70327 Stuttgart - wangen  
Amadekar: KOMKAR

26.03.2005 seet: 18:00  
Navnîşan: Bürgerzentrum  
Neue Vahr  
Berliner Freiheit 10  
28237 Bremen  
Amadekar: Komkar, PDKI, PDK, PSK

19.03.2005 seet: 18:00  
Stockholm / Swed  
Amadekar: Federasyona Komaleyê Kurdistanê li Swêdê



- Nizamettin Arıç
- Metin-Kemal Kahraman
- Neşerur Aktas
- Şehla Alaaan
- Nûsan
- Keram Gardenseri

Aşkstean:  
Av. Medînat Ayhan

**20.03.05**  
13:00

## AI: Dewleta ûr teda Kurdan kena



Komelê heqî merdiman ê enternasyonal (AI) Hukmatî ûr ra waşt ke teda û zulm Kurdan nêkîro. Goreyi agahdarîya AI semedi ke 8 Adar rojî Cinîyan beno nîzdî, Hukmat ûr Kurdan ser ziwarî xo kerdo zixm.

AI no eşkirakerdi xo de ca dûno teda ke ûr bajarî Senedaj de keno Kurdan. No demô peyin de hukmat ûr zaf ziwar nawo komelê heqî qican, komelê cinîyanî Kurd ê aşîti û heqî merdiman ser. Xebatoxî nê komelan hukmat ra zaf gefan wenî.

Endamî Komelê heqî Qican Azad Zamanî eşkira keno ke komelê ûnân 2 serî cuwa ver nîyaya rue û semedi heqî qican xebityena. Ûr de qîcî zi yenî cezakerdi û heta yenî dardkerdi.

Komelê heqî Qican verba alıqnayîsi qican vêcyena. Hukmat ûr xebatoxanî na komel ra Azad Zamanî û Diba Alikanî rojê 8 Adara ver giroti binî çiman.

## Platformî cinîyan Çewlig de rojê 8î Adar Fîraz kerd



**Çewlig-** Platformî cinîyanî Çewlig rojê 8î Adar fîraz kerd. No platform endamî çend komelanî sîvîl ra yeno meydan. Piyerî endamî no platform cinîyi. Platformî Cinîyanî Çewlig rojê 8î Edar de Ganç cadesi ser de yew kombiyayısi çapamenî viraş. No kombiyayısi çapamenî de SHP ra endamî meclisa beledeye Suna aka eşkirakerdi Platform wend.

Platformî cinîyanî Çewlig fîraz kerdî 8î Adar rojê cinîyanî dînyaya pey çîçek dayî dadîyanî qicanî ke 2003 de mektebi Çeltiksu de Banlerz ra merdi.

Meletî de cinîyan waşt ke yew şiyâyiş virâzî, poles midahaleyi no şiyâyiş kerd û 7 cinî giroti binî çiman.

Stenbol de cinî Parqê saraçhane de amê piyeser û waşt ke hetî Beyazit'a şiyâyiş virâzî. Poles bi bombejanî gaz û copan est cinîyan ser û ûnân ra 65 giroti binî çiman. Roja bin poles ûnân re 58 cinî veradayî.

Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê zi roja 8ê Adar de lokalê federasyon de sehet 17.00 heta 19.00 rojê cinîyan fîraz kerd.

*Alaqa: seyidxan@peyamakurd.com*



## Çewlig - Navçeyî Çewlig Xolxol de wendoxanî mektebi lise û mektebo verin yew komê tiyatro na rue. Na grubu tiyatro kayê xo yo verin "Çarexi Kehenî" kaykerd.

Navçeyî Çewlig Xolxol de wendoxanî mektebi lise û mektebo verin yew komê tiyatro na rue. Na grubu tiyatro kayê xo yo verin "Çarexi Kehenî" kaykerd.

Çewlig - Navçeyî Çewlig Xolxol de wendoxanî mektebi lise û mektebo verin yew komê tiyatro na rue.

Na grubu tiyatro kayê xo yo verin "Çarexi Kehenî" kaykerd.

Gruba xortanî Xolxol ê tiyatro 11 wendoxanî ra yeno meydan. Kayî "Çarexi kehenî" kitabı Yahya Akengin ra vira-zîyawo. No kay malîmî edebiyat ê liseyî Xolxol Murat Tunç idare kerdo. No kay raya verin Xolxol de hewşê Perwerdeyi gel (Halk Egitim Merkezi) de kaykerd. Kayî "Çarexi Kehenî" şar ra zaf alaqa

## Xolxol de wendoxanî Kurd kayî tiyatro kaykerd

Navçeyî Çewlig Xolxol de wendoxanî mektebi lise û mektebo verin yew komê tiyatro na rue. Na grubu tiyatro kayê xo yo verin "Çarexi Kehenî" kaykerd.


dî, no rid ra cuwa pey Gexe, Azarpêrt û Depi de zi kaykerd.

Na grub wazena xebatê xo birûmno û no qide Xolxol bido sîpasnayî. Serekî Belediyê Xolxol Haşim Akyürek zi na xebat ser ina vûno: "Ma wazeni nê xortan re yew ca vinî kî ey rahat karî xo bikeri. Ma nîwazeni na grub vila bo, ma amadeyi her qide destek bîdi nê xortan".

Gruba tiyatroyî Xolxol wazena kitabı Refik Erduran "Sonikê Heş" sey şano semedî sahneya amade bikeri.

## Çewlig de humarî kesanî ke xo kişenî beno zaf

Zafî insanan bi tifinganî koriciyan xo kişî. Serrê 2001 de 15, 2002 de 9, 2003 de 6 û 2004 de 12 kesan piyer piya 41 kesî xo kişib. Ûnân ra 14 kesî zerrê Çewlig ra, 27 kesî zi Dewanî Çewlig ra yi



Çewlig - Goreyi raporî komelê heqî merdiman ê Çewlig humarî kesan ke emser xo kişî yan zi merdişî ûnân de şuphe esto % 100 par ra zafo.

Goreyi nê raporî kesanî ke pê tifingî xo kişî, tifingî koriciyan kar ardo. Zafî insanan bi tifinganî koriciyan xo kişî. Serrê 2001 de 15, 2002 de 9, 2003 de 6 û 2004 de 12 kesan piyer piya 41 kesî xo kişib. Ûnân ra 14 kesî zerrê Çewlig ra, 27 kesî zi Dewanî Çewlig ra yi.

Nê kesanî ke waşt ke xo bikişî ûnân ra % 50 merdi.

Goreyi raporî IHD binatê seranî 2001

- 2004 de 83 kesan waşt ke xo bikişî. Kesi ke wazeni xo bikişî, zafî ûnân binatê 14-25 seran de yê. Ita de hûmarî cinîyan û camiyerdan sey ciye yo.

7 kesan pê tifingî xo kişî, ûnân ra 7 kesî keye koriciyan ra yi. Çend xortan zi esker de xo kişî.

Goreyi nê raporî sebebî xo kişî persî sosyal, abori, kulturi, polotîki û xerbî nê 15 seranî pîyinan o. Heta nê persî çarenbî, veri xo kişî insanan nêgerîyo no.

## Barzanî û Talabanî semddî ruenayışî Hukmatî Iraqa amê piyehet

Mesud Barzanî va ke ma re şexs muhim niy, ma re programî siyasi muhimî. No rid ra zi kam ke waştanî Kurdan qebul bikero, ma paşt dûnî no programî.



Selahedin - Heftekû viyert semedi ruenayışî hukmatî Iraqa Şî Ibrahim Caferî veri Selahedin de Mesud Barzanî, cuwa pey zi Qeleçolan de Celal Talabanî zi yaret kerd.


Ibrahim Caferî ya pey Mesud Barzanî û Celal Talabanî Selahedin de amê piyehet û ruenayışî hukmato newe ser qisêkerd. Mesud Barzanî û Celal Talabanî kombiyayısa pey yew preskonferans

viraşt û ita de verba grubanî ciya ciya ê Iraq behsî tewra Kurdan kerd.

Mesud Barzanî va ke ma re şexs muhim niy, ma re programî siyasi muhimî. No rid ra zi kam ke waştanî Kurdan qebul bikero, ma paşt dûnî no programî.

Celal Talabanî zi preskonferans de va ke ma nîwazeni myanî hêzânî Kurdan de problem vecîyo, kam problem veco, o biyero ceza kerdî.

## Derwêş û Zel



### Selim Cürükkaya

Derwes dewe ma ra bi, o zaf feqribi, zaf bêvengib. O Heta ke mecbur nêbin, xeber nedayn.

Yew banî ey bi, yew cinî ey, deheb mangî ey, panc heb bizi ey, çend heb zi qîcî ey bi.

Yew derdi ey bi, yan çineb, ez nêzûna. Ey çine ra xeber nedayn, ey zi ez nêzûna.

Yew zelê ey bi. A zela ke ey cinen, çew nêşken bicen. Wext ke ey zel giroti yeri destî xo, o Derwes şînî, yew na merdim ûmîn. Ey pê zelê xo hend ci vatîyen ke kere niştiyen rue û bermîn, dar û ber guevend girotiyan.

Cewras serr cuwa ver dewê Sirin de yew vêve bi. Wahari vêvi venda Dewres zi dabi. Dewres zelê xo girot û kot rayet. Zîmistan bi, bibi puk, Derweş nîzdiye dew de rayeri xo kerd vin.

O unvard si, qeyme si, nata si, weta si, çimî ey bi tarî, o gina erd re. Vor varey ey ser, o binî vor de mend.

Dî asmî cuwa pey varan var, vor heliyay. Yew sunî di ke yew merdim ho erd de rakote. O si ewniya ci, ey di ke eg Dewres, Zelê xo wişk tepista û xo re rakotî.

## Ebukat A.Zekî Okçuoglu: Mahmut şakar bi helikopterê leşkeriya şî Qendîl

**Almanya-** Ebukatî Abdulah Öcalan ê kehen A. Zaki Okçuoglu yew reportajo ke Selim Cürükkaya de viraşto vûno ke Mahmut şakar bi helikopterê leşkeriya şî Qendîl, o yew merdimo tarî yo. A. Zokçuoşlu idayana xo ina rumneno: „Wext ke A. Ocalan newe tepişa ez û Mahmut Şakar piya ebukatî ey bi. M. Şakar bi helikoptera şî Qendîl, ey serektîye PKK re, mesajî A. Ocalan berd. O wexta pey politikay PKK bin ra bediliyay. Bacê M. Şakar se ke qet taway nébo, hêna ame buro. Mesulî PKK ê Ewropa ê serranî 1990 kanî Yilmaz zi nuşteyî xo de nuseno ke Kongreyê Kongra-Gel ê didin de Mahmut Şakar qerâri herb girot.

## Derheqî Kirdkî (Kirmancî) de kombiyayısi des û hîreyine viraziya



Mîyanê 28.02.2005 û 04.03.2005 de, nêzdîyê Stokholmî de Lövstabruk de, raştnuştişî Kirdkî ser kombiyayısi 13ine ê grûba Vate viraziya.

Raştnuştişî Kirdkî ser kombiyayıso vîrin aşmî Tebax 1996 di viraziya bi. O kombiyayısa nat yew komê kesan ke zaravê Kirdkî ser xêbitiyenî, her ser yew ray yêni piyeser û tayn persan raştnuştiş, standartizekerdiş û verdberdişî Kirdkî ser pîya xebat kênî. Qido ke yenû zûnayış Kirdkî ser heta inkê zaf kêm xebata ilmî biya. Ini însiyatif, xebatê ziwan xo re kerda yew armanc û wazena na xebat bi îstîkrar birûmno. Her kombiyayış de çend kesî ciya ciya temayan ser wa-zîfe gênî û querê temayê xo karî xo keni hedre, no kar xo ûnî kombiyayış. Kombiyayış de na xebat ser minaqaşa bêna û querê meylê kombiyayış xebat şiklê xo ey pêyin gena.

No însiyatif ke zaravê Kirdkî ser xebat kenû pey namê „VATE“ yew kovar zi vecenû. Kovara „VATE“ heta inkê 23 hûmar veciyaya. Her kombiyayış de xebatê kovar ser zi qisêbeno. Piyerê hûmaranî kovara „VATE“ Tirkîye de zi vêciyayî.

Her nuştoxi kovara „VATE“ problemî raştnuştiş ke nuştişî rojane de raşt yeno û têna nêşkeno çarebikero, dûno arîye û ûno kombiyayış. Îta de însiyatif pey mişevirye nê persan hal keno.

Kombiyayısi hîresinê de sey her kombiyayısi verî xebatê kovara „VATE“ ser ame qisêkerdiş û cuwa pey zi ê kesan ke pers ïnan ey raştnuştiş bî, pêrs xo texte de nuştî û însiyatif no persan ser minaqaşa viraş, guerê zunayê xo no persî care kerdî.

Kovara vate û xebatê inî însiyatif ser pê numê Vateonline yew Homepage(Pêlkîyi) zi estû. Wodox eşkêni kovara „VATE“ û xebatê ini însiyatif internet ra zi taqîp bikiri.

Nê kombiyayısi de, amadebîyayoxî nê meseleyan ser o vindertî û meylê xo tesbit kerdî:

- 1-Rastnustis (imla)
- 2-Çekuyê kincan/cilan
- 3-Çend çekuyê neweyî

Nê kombiyayısi de nê new kesî amade bîyî:

Aydin Bingol (Gimgim), Münzûr Çem (Dêrsim), Haydar Diljen (Sêwregi), Wisif Kaymak (Piran), Huseyin Kulu (Dêrsim), M. Malmisanij (Piran), Selim Mûrat (Pali), Mehmet Tas (Dêrsim), Sukrî Urgun (Hêni)

## Kurdanî Muhîh Mele Mistefa Barzanî Vîra nêkerd

Qisêkerdişî temsîlkari PDK ya pey temsîlkari PSK, YNK, Yekiti- Suri ji derheqî tekoşîna M. Barzanî û halî ewro û Kurdistan ser vînayê xo peşkeşî

PDK 1ê aşme Adar de bajarî Munîh de semedî vîrardişî nemir M. Mustafa Barzanî ya yew kombiyayış viraş.

Emser 26 serrî yo ke egitî Kurdan M. Mustafa Barzanî şû rehmet. Kombiyayışî vîrardişî M. Barzanî bi rezgirtinî şehîdan dest ci kerd. Cuwa pey temsîlkari PDK ê Munîh derheqî ciwyiyayî, tekoşîn û politikay M. Barzanî ser agahdarî da misafiran.

Her çar parçeyî Kurdistan ra nûneranî partîyanî siyasi û kesanî welatheskerdo-xan no kombiyayış de ca girot.

Qisêkerdişî temsîlkari PDK ya pey temsîlkari PSK, YNK, Yekiti- Suri ji derheqî tekoşîna M. Barzanî û halî ewro û Kurdistan ser vînayê xo peşkeşî misafiran kerd.



## Di Cûntayî û Cûntacîyi emir Derg

### Hespi Aydin

Cûntayî Evrenî û Pinoşet zaf monenî yew bînan. Nê wird cûntacîzi pê darbeya ameyî hukum ser. Sey faşizmî Alman û İtalyanî pê vîcnayîsa néameyî iktidar. La ïnan zi sey her qide faşizm sikiyonetim nawo rue, zaf teda, zulm û ziwaro giran şarî ser rumnawo. Nê wird Cûnta zi pê eynî teqtik û metodona xebityayî. ïnan heti ser hukim de mendiş û saxlemkerdiş iktidarî xo de sey ciye gure kerdî.

Nê wird Cûnta û Cûntacîzi ewro hukum ser de niyi. La Şili û Tirkîye de tam tesîri eskeriyayî esto û no rid razî verî ruenişi demokrasî de astengî gird estî. Nê wird cûntayan zi semedî xo û elitanî xo ya qanunî intiyazî viraşti. ïnan mehkemeyî û refî eskeriya pê merdimanî xo ya xemilnayi. Semedî sucdaran û qetilkarana ef vetî. ïnan hetani pêni ciwyiyâsi xo cayî xo kendo garantî. Yew wexto derg de nê wird cûntayan hukum û iktidarî xo şarî ser de rûmito. Sistema xo kerda saxlem û bingehîn. Cuwa pey iktidar ra kotî duryan zi ameyî durvistiş.

No rid ra heta ewro zi muhalefet nêşkeno nê wird Cûntacîyan, walî û generalanî ïnan bido mehkema kerdî. La ewro roj ma vînêni ke Baroyî Diyarbekir semedî kişîşî û vînkerdişî xeli yet insanan Hayri Kozaklıoglu, Ünal Erkan, Hikmet Köksal û 31 embazî ïnanî sucdarî dayî mehkema. Na yew gama zaf camîyerda û zereyî ma û may û pî kiştan, vînkerdan û şarî ma pê zaf kena şâ. No proses ganî dom bikiro û verdüero. Ganî ma Kurd û demokratî Tirkân xebat bikiri ke qetilkaranî henzar Kird û Tirkân vêciyî werte û veciyî verî mehkema. Zaf ray Kirdan hukumat Tirkân, yan zi eskerî Tirkân dawo mehkemaya navnetewî û xêliyek dewa zi qezenc kerdî. Tirk mecbur bî û Tazmînat dawo medurran. Sey dewayî Yeşilyurt.

Ma ewro ewnîyeni ke ,rewşê gelê Şili zi sey mayo. Ey zi hama newe eşkenî Pinoşet bîdî mehkema. Şili de hendê 3000 insan amebî kişîş. Cesedî taynan hama zi néamo vînayî. Şili de 800.000 insan amebî işkence kerdî, 10.000 kes zi memleketî xo terk kerdî û şibi xeribê.

Tirkîye û Kurdistan de zi 5.000 dewî Kurdan ameyî xirabekerdî. 35.000 insanî ameyî qetilkerdî. Bi henzarân insan zi semedî ke demokrat û welatheskerdo bî, ameyî işkencekerdiş û hepiskerdiş.

Nê wird Cûntayan zi sendiqayî karakeran kerdî qedexe. Krizî aborî re yew derman nêardo. Bê gureyî biya zaf. Measî karker û memuran se ra pansas biyo kêm. Heq gêrayış, grev kerda qedexe. Wird Cûntayan zi sermayedaran re, tekelciyan re xizmet kerdî. Vengî muhalefetî dawo birnayış. Partiyî cepî

### Xonîşandayışî Kurdan verî konsolosî Suriye ê Swed de

Stockholm- Însiyativa Kurden Sûriyeyê li Swêdê (IKSS) semedî protesto kerdî biyayeyanî Qamişlo rojê 12 Edar de verî konsolosî Suriye ê Stockholm de yew xonîşandayış organize kerd.

û komînist qedexe kerdî. Pinaşet pê „Operation Contor“ a mihalîfan ser zulm û qetilkariye devlet teberî welat de berdevam kerdî. Karî ïnan ê politîk de engel vetî û ïnan ser tehdîti xo rumito. Sebebî ameyîsi nê wird cûntayan zi eynî yo. Tirkîye de çinê karkeran grevi gird viraştenî. Welatheskerdoxî û cepî Kurdan û Tirkân zaf hol organîze bibî. Sikiyonetim niyabi rue. Amed û Agri de Kurdan serekîtiye Belediye qezenc kerdib. Şerafetin Elçî meclisê Tirkân de vâtib ke “Ez Kurd a û Tirkîye de Kurd estî“. Binatayî rexistinanî Kurdan de Yewbiyaye hezi Netewî (UGB) niyab rue. XO organîzekerdişî Kurdan neteweperst û şovenîsti Tirkân rehetsiz kerdib.

Pinoşet zi vatêni ke ez Şili kena mîsal yew dewlet. Ez wazena ke têna çerxî dewlet ke bû xirabe, hêna viraşî. Ey vatêni ke ez nêwazena iktidar de zaf bimanî. Ey banî hukmat da bombakerdiş. Zerre de serekwezir Salvador Allende (Dinya de sosyalîst yewin bi ke pê vîcnayîsa ame bi hukim ser) ame kişîş. Allende mergî xo ya ver Radyo de ina vâtib: “Emekdari welat mi, bawerî mi Şili re û ameyê Şili re esta. Ê ke mina pey yeri, na tariyea xayîn û pîs kenî vila“

Him Pinoşet serre 1978 de û him zi Evrenî 1980 de semedî yasaya esasî ya referandum viraş. Wird Cûntacîyan zi waştîyen ke Cûntayanî xo re yew qilifo demokratî vînî û pê na ya xo sey demokratî lânse bikirî. Şili de pusulanî rayan de ina nuştib: “Verba hukmatî welat ma ya yew eriş(saldırı) esto. Verba nê erişan Pinoşet şerifi Şili queri keno. Ez semedî domkerdişî no iktidarî rey dûna.“ Binî nê de zi „ê“ û „nê“, têna bi. Wextî Cûntaya Evren ê 1980 de zi eynî o qideb. Wird yasayı esasî zi anti-demokratîk bî; pê ters û tehdîtana ameybî qebul kerdî.

Wird Cûntayan zi paşte xo da bî IMF û NATO. Tekelanî international zi doletiye nê welatan talan kerdib. Pê reçeteyana nê wird Cûnta zi amebî terbiye kerdî.

Wird Cûntayan zi aşmî Elun de ameyî hukim ser. Belkî zi sebebî aw bi ke, faşistanî Almanan, Faşisto gird Musolinî hepîs Itallya ra xelesna û berd Almanya.

Çiko hol esto ke, ewro roj çend tesîr nê wird Cûntayanî şarî Şili, Kurdistanî Bakur û Tirkîye ser bîbo zi, fîlî hukim ser de niyi. Reyê mehkîma kerdîşî nê wird diktatoran û elitanî ïnan bu a. Her welat û insanheskerdox hevî keno ke tekoşînê gelanî ma nê diktatoran û embazanî ïnan biyaro verî mehkîma û ceza bido ïnan.

IKSS venda piyêrê Kurdistanîyan, kesan, komele, dezgeh û rîexistinanî siyasi û cemaati ê kurd û swêdî û ê enternasyonal keno ke paşt bîdî no karî ïnan.
















لەپەرەپە

٢٠٠٥/٣/١١

رۆزئامەيەكى ھەفتانەي گشتىيە

زمارە ٢٧ ( سالى يەكم )

## بەھار و نەورۆز، سەركەوتن و نسکۆ، شۆپش و راپەرين، ھەلەبجە و ئەنفال، ھەلمەت و قوربانى، كۆپ و بەرھو نادىيار ..



ھەيزىشى ئەنفالە بەدناؤەكانى دەستپىكىد. لە ١٩٧٤ واتە دواي ٤ سال لە رېتكەوتن و ئاشتى، رېتىنى بەعس لە زۆربىيەتىن و رېتكەوتتىنەكان پەشىمان بۇووه و دانى بە كوردىستانىبۇونى كەركوكدا نەتا و خۇي ئۇتۇزمىيەكى كارتۇنى راگەياند، شۇرۇشى كوردىش ئەمەي بىي قابول نەكرا و شهر ھەلگىرسايىھە، سالىك دواي ھەلگىرسانەوەي شەر و لە ھەمان مانگدا، رېتكەوتتىنە ئەلەجەزائىرى بەدناؤ مۇز كرا كە پلانىك بۇو بۆ لەباربرىنى شۇرۇشى كوردى، لە ١٩٨٨/٣/١٦ رېتىنى فاشىسىتى عىزاق ھەيشى دەندانە خۇي بە سەركەوتن، كەركوكى دلى كوردىستان، چەكى كىمياوى بۆ سەر شارى ھەلەبجە ئەنجامدا، ھەزاران ئىن و مىنلى بىتاتوانى شەھيد كرد، بە دوشىدا

بۇ لەپەرەپە

## پىرۆزبىتى مارس رۆزى جىهانى ژنان



دەزانىن، فىدرالى واتە يىكىرن، بەيەكەوە ژيان، بەكىارچەي. شىكىرنەوەي فىدرالى لەدەستورى ئائينەدى عىرالقا بەپىتويسىت زانى بۆ ھەمووان، چونكە پىتاكەتى عىراق زۆر جىاوازە لە ولاتانى ناوجەكە. دەربارەي ئەو فىدرالىي كە كەلى كوردى داوى دەكاك، گۇوتى: فىدرالى كەتىرىن مافە، ھە داخوازىيە كەلى كوردى زۆر كەمە و كەلى كوردىستانەقى مافى چارهنىسى خىيان و لاتىكى سەربەخزىان ھە، لە درېزىدەي قىسەكانىدا گوتى: كوردىكەن داوى يەكىرتتەوە دەكەن لەكەل عىرالقا نەوەك، وەك ھەندى شوفىنى عەرەب دەملەن جىابۇونەوە.

دەربارەي شارى كەركوك گۇوتى: چەند رۆزىكى تر ماوەيەي سالىك تىپەر دەبىت بەسەر دەرجۇونى مادەي ٥٨ لە ياساى كات ئىدارەي دەولەت كە ھېچ شىتىن نەكراوە بۆ ئاوارەكانى كەركوك، كە سەدان ھەزار كوردى كەراوە لە شارى كەركوكدا لەزېرى خىمەدا دەزىن و تاۋەكۈيستاش قوربانى دەستى رەتىمى لەناوجۇون.

دەربارەي گۇرپىنى ديمۇگرافى شارى كەركوك وەيتانى عەرەب بۆ ئەشەشارە، گوتى: كەركوك شارىكى كوردىستانىيە وەمۇ باڭىنامە مىزۇوېيە عىراقى و بىيانىكان دەي سەلمىتنى كە كەركوك شارىكى كوردىستانىيە.

ووتى: ئۆرى گۇمانى ھەيە لە كوردىستانى بۇونى ئەو شارە؟ باپرون بەلكە نامە مىزۇيەكانى عىراق بخۇيتنەوە. دەربارەي گۇرپىنى ديمۇگرافى شارى كەركوك، چەند نۇونەيەكى باسکەرد كاتىكى كە لەشارى بۇ لەپەرەپە

• لە ١١/ئازار/١٩٧٠دا، شۇرۇشى ئەيلول دوزمنى ناچاركىد دان بە بۇونى نەتەوەي كورد و مافە كانىدا بنى.

• لە ١١/ئازار/١٩٩١دا، لە درېزىدەي ھەلمەتەكانى رەپەرين، شارى ھەولىر ئازاد كرا.

**مستەفا چوارتايى** - مانگى ئازار ئەگەر بۆ گەلەنی دىنيا بە واتاي كۆتايىھاتنى زستان و ھاتنى وەرزى بەھار بىت، ئەوا بۆ نەتەوەي كورد گەلەك واتاي مەنلىق لە خۇ دەگرى. مۇۋىقى كورد لەگەل بىستىنى ناۋى ئازار، راپەدوو و نىستا و داھاتوو لە پىش چاودىغا خۇ دەنۇنىنى، تاسەدەي نۆزىدەم، مانگى ئازار بۆ كورد؛ سى بۇنەي گىنگ، ئەوانىش ھاتنى سالى نوى، چەزنى نەورۇز و سەركەوتن بەسەر ئۆزىدەھاڭ دا و ھاتنى بەھار بۇو، لە سەرەتاي سەددەي بىستەمەوە چارەنۇرسى نەتەوەي كورد بەريکەوت ھەموو رووداوه گىنگەكانى خۇزى خزانىد ناو ئەم مانگەوە، لە ١٩٢/٣/١٤ دا باوکى رەوحى كورد سەرەزكە مستەفا بارزانى لەدایك بۇو، ھەر لە سەرەتاي ئەم مانگەشدا و لە ١٩٧٩/٣/١ دا مالاثاىيى يەكبارى لە ژيان كرد، ھەرۋەها سەرەزكە كۆمارى يەكەم دەھولەتى كوردىستان ئازار ١٩٤٧دا لە سېدارە درا. لە كۆتايى مانگى ئازار ١٩٤٧دا شۇرۇشى ئەيلول دواي ٩ سال خەبات و قوربانىدان، دۈزمنى داگىركەرى ناچار كرد بۆ يەكەم جار لە مىزۇودا دان بە نەتەوەي كوردى بىن و ملکەچانە ئۇتۇنومى ئىمزا بىكەت، جىتى ئامازىدە، ئەو كاتە سەددامى دېكتاتور جىڭىرى سەرەزكە كۆمار بۇو، ھەر خۇيىشى ھاتە ناو پىردان و لە قوتاپخانىيەكى سەرەتايىدا رېتكەتنى لەگەل سەركەدەي شۇرۇشى كورد مستەفا بارزانى شۇرۇشى كوردى بەسەر ئۆزىدەھاڭ دا

**كاماران ئەممە سەليمان - ھۆلەندى** كلتوري كوردى لەشارى دانھاخ و ناۋەندى ھەلەبجە دىز بە ئەنفال و جىنۇسايدى كور، چاڭ، رۆزى شەممە ٢/٥ لەشارى دېلىفت بەيەكەوە كۆرەكىيان بۆ ياساناس و قازى "زۇھىر كازم عەبۇد" بەپەشدارى ئەمەرەيەك كورد و عەرەبى دانشىتوى ئەوشارە و دەوروبەرى بە ناو نىشانى خالە گىنگەكانى رەشنسوسي دەستورى ئائينەدى عىزاق و دوا، رۆزى فىدرالى و چارەنۇسى شارى كەركوك رېتكەست. سەرەتاي كۆرەكە بەناۋى ھەرۋەدوو رېتكەواھە بە خېرەتلى ئامادەبۇنڭارا. زۇھىر كازم لەسەرەتاي قەسەكانىدا باسېكى لەسەر دەستور و دین و دەولەت و دادگاى دەستورى ياسىكى، ئامازىدە بىياسو دادگاكانى سەرەدەمەي رېتىنى لەناوجۇو سەدام و ئەو تاۋانانە كەر كە بەرامبەر ھاۋاتىان ئەنجامداوە. دەربارەي دەستورى ئائينەدى عىراق گۇوتى: دەبىت نۇسېنەيەدەي دەستورى ئائينە بەتەۋاق بىت و مافى ھەمووان پارىزىراۋىتت لەو دەستورەدا و دەبىت دين و دەولەت لەيەك جىباڭرىتىۋە، چونكە مافى بەشىك لەناوجۇو نۇسېنەيەدەي دەستورى ئەسەر دەستورى رېتىنى لەناوجۇو ھەتىباپە، كاتىك كە ئەو قازى بۇوە لە دادگاكاندا خەلکى يەزىدى، مەسىحى و سوبى بەو ياسايانە دادگاپى كراوە، لە قەسەكانىدا زۆر تەنگىدى لەجىاڭىرەنەوە دين و دەولەت سەرەبەخۇزى ياساپ دادگاكان دەكىردوە. دەربارەي فىدرالى گوتى ھەمووان مانى فىدرالى

## ياساناس زۇھىر كازم عەبۇد: كەركوك شارىكى كوردىستانىيە و ھەركەسېك گۇمانى ھەيە بابچىت مىزۇوېي عىراق بخۇيىتەوە

